




Salvegera Raperîna
15'ê Gelawêjê:

**Ji nebûnê ber bi
dewletbûnê ve**

A. Aktas

Cejna Vejna Gelê Kurd 15'ê Gelawêjê li hemû azadixwazên cihanê pîroz be!

Azadiya WELAT



SAMI TAN

Dibe ku demekê şovenîzm bandorê li gelê tirk bike, lê êdî ew jî ji vê bîrdozê xesarê dibînin. Dema gelê tirk ji bin bandora vê bîrdozê derket, dê cûdakarên rastîn derkevin holê.

Cûdakari û şovenîzm

Hêzên dagirker li hemberî geşbûna doza neteweyî ya kurdî dest avêt ceka zengarî şovenîzmê. Cendekên hêzen dewletiyên ku di şer de hatine kuştin, ji xwe re dikin çek û ji bo berzkirina hestên şovenî bi kar tînin. Gotina wan a sereke jî "cûdaxwazî" ye. Li gorî wan kurd dixwazin erdê wan parçe bikin. Li hemberî vê gotinê berpîrsên tevgera azadîxwaz a kurd didin zanîn ku doza wan ne doza parçekirinê, berevajî vê yekê doza wan yekîti û wekheviya gelan e. Tê daxuyandin ku Yekîtiya Kurdistanê di yekîtiya gelên Rojhilata Navîn re derbas dibe. Gelê kurd di navbera gelên herêmê wekî pira tê dîtin.

Tevî vê helwesta diyar jî, hêzên dagirker ji bo ku rewşa heyî mayinde bikin, propogandaya xwe didomînin. Dema mirov gotin û kirinên wan dide ber hev, nakokiyêke diyar derdikeve holê. Berî her tiştî welatê kurdan wekî cihê sirgûnê tê bikaranîn. Kes naxwaze

biçe li bajarên Kurdistanê bixebite. Lê dîsa jî dibêjin: "Em ji xîçekê vî welatî dikarin xwe bînin kustin." (Bi rastî jî xwe ne, lê ezelek zarokên gundî û karkeran didin kuştin.) Li her cihî bi çavên sûcdaran li kurdan dinêrin. Dema li cihê kontrola polîsan hebe, kesên jî bajarên Kurdistanê de jî sedî sed bînin binçavkirin. Lê dema gotinê ser kêşeya kurd, ew didin zanîn ku her kesê ku li ser vê xakê dijî wekî hev, heta ku cûdakariyê neke bi tu astengiyê re rû bi rû namîne.

Ev tişt jî nîşan didin ku dagirker bi xwe cûdakarin. Jixwe li ber çavên wan tu car bîndest û serdest nabin yek. Kurd jî her tim li nik wan (heta ku ji sedî sed neyên piştaftin) sûcdar in.

Mînaka dawîn a cûdakariyê ya rayedarên dewleta tirk heftiya çûyî hate dîtin. Waliyê Orduyê Kemal Yazıcıoğlu bi hinceta ku saloxgeriya PKK'ê dikin, karkerên kurd nexistin nava sînorê bajêr. Jixwe piştî her çalakiya gerîla ya li herêmê, bîrek karkerên kurd têne binçavkirin.

Ev rewş rastiyeke din jî nîşan dide; tevî hemû galegalên wan ên bêbinyad jî, dagirker jî têgihîştine ku kurd û tevgera azadiyê jêk cûda nabin. Her wiha êdî gelên din ên Anatoliyê jî dikevin bin bandora bîrdozê ve tevgerê. Ev yek wan gelekî ditirsîne, lewre jî êdî dev ji hemû rêz û rêçikên xwe jî berdidin û dest davêjin metodên wîha eletewş.

Ji bo demeke kurt dibe ku şovenîzm li ser gelê tirk bandorê bike, lê êdî ew jî ji vê bîrdozê dijmirovî xesarê dibînin. Dema gelê tirk ji bin bandorê ve bîrdozê nemirovî rizgar bû, wê gavê dê cûdakarên rastîn derkevin holê û de hesabê zilma salan ji wan bê pîrsin.

Di 15 saliya hilperikîna 15 gelawêjê de gelê kurd ber bi serkeftinê gavên mezin davêje. Êdî pispor û pênuşkêşên dagirkeran jî ve rastiye dibînin. Lê şovenîzmê pergala bi tevahî xitimandiye. Tiştê ku wekî rojê diyar ev e ku dagir bi vî qûşî nagihêjin Mûşe, lê dîsa jî ew nayên ser çiya çareseriyê. Lewre jî êdî

Du tovên bi mirov re: Jiyan û mirin

Ferhengok

arizîkirin: özelleştirme
aya: gelo, ecebe
bestenî: dondurma
beşer: mad, mirûz
betlane: tatîl
bêgane: mirî, nezindî
bûy: dawet
çavpêketin: hevpeyvîn
çewlik: çiftlik
ciyawazî: cudahî
dîrawse: cînar
êsta: niha, nika
firk: kramp
gernas: leheng, qehreman
gewre: mezin
henderan: xerîbî, biyanistan
hewîn: sebr, aramî
hilpasbûn: hilkişîn
hinarde: ihracat
karîger: etkin
keldûman: buhar
kesayetî: şexsiyet
lajwerd: maden
lûle: boru
mang: meh, heyv
melkemot: ezraîl; cîn
newirandin: mîrildanmak

nûser: nivîskar
pawan: tekel
pengêgirt: di kar de serketin
peyitandin: selmandin, îspatkirin
pîle: derece, radê
qerzîkirin: deynkirin
ramyarî: siyasî
raperîn: pêngav (atılım)
seyrangeh: cihê kêf û pîknîkê
şebilîn: hişkbûna laşê mirov
şênî: ahali
tamar: mahmurluk
teger: asteng
tewan: karîn, şiyar
tewawkirin: qedandin
veberhênan: yatırım
vejen: enerjî
wuşe: peyv, bêje
yarmetî: alîkarî
xuricîn: rijîna stêran
zanko: zanîngeh, unîversîte
zor: gelek, zaf
zorbeyî: piranî, zêdeyî

ADAR JIYAN

Jiyan, di wateya madî de pêvajoyeke bîsinor e. Lê belê di wateya giyanî di bêsînor e. Mirin jî, ji ber ku sînorbûna jiyanê hînî mirov dike, gelekî watedar e. Ger ku mirin nebûya, jiyan jî nedihat naskirin.

Çawa ku hemû tişt bi dijberiya xwe watedar dibin jiyan bi mirinê û mirin jî bi jiyanê watedar dibe. Ji aliyê fizîkî ve ev her du tişt jî hev û din re dibîne sînor, lê ji aliyê giyanî ve ev her du tişt wekî du dijminên bihêz li dijî hev û din şerêkî dijwar dimeşînin. Hemû tişt dijberên xwe di hundurê xwe de dihewînin. Yanî em dikarin bibêjin, hemû dijber bi hev re dijîn heta demekê. Belê şerê di navbera wan de tu caran ranaweste. Wekî hemû dijberiyên, jiyan mirinê û mirin jî jiyanê di xwe de dihewîne.

Yek dibe hûtê ya din û wê dadiqurtîne. Ev her du hêz tim li dijî hev û din şer dikin. Şerê jiyan û mirinê şerê hebûnê ye. Di encama vî şerî de kîjan bi ser dîkeve, ew serê ya din dixwe.

Îro şerê ku gelê kurd dimeşîne, şerê jiyan û mirinê ye. Şerê navbera gelê kurd û dagirkeran, şerê hebûn û nebûnê ye. Têkoşîna rizgariya gelê kurd; têkoşîna rizgariya mirovahiyê û têkoşîna bidestxistina jiyanê nûjen e. Jiyan, tenê, ne hilmstandin û hilmdayîn e. Jiyanêke bêrûmet û bêniyx mirin e. Yê ku nexwaze vî barî jî ser stûyê xwe hilîne dê ew rojê hezar caran bi mirîfî bi-

jî. Belê gelê kurd, birêxistin û bibiryar dest bi kar û barê jiyanêke binirx û birûmet dike. Îro, mirovahî li navenda cîhanê, di Rojhilata Navîn de û li Mezrobotan ji nû ve di dergûşa şaristaniyê de doş dibe. Li dijî mirina ker û kor û lal tovê jiyanê diparêze. Tovê ku bi destê bav û bapîrên kurdan hatibû reşandin, îro li ser koka xwe şin dibe û li ser xaka pîroz şaxan vedide. Ev şax, şaxên jiyanêke bêsînor û bêmirin e. Li aliyê

Em dikarin bibêjin, hemû dijber bi hev re dijîn heta demekê. Belê şerê di navbera wan de tu caran ranaweste. Wekî hemû dijberiyên, jiyan mirinê û mirin jî jiyanê di xwe de dihewîne.

diyan jî, dijminê jiyan û mirovahiyê bi hemû hêz û derfetên xwe, xwe li karê jîholêrakirina jiyanê girê dane. Ne xem e, mirina ji bo jiyanê de tim û tim bi ser bikeve. Gelê ku nizanibe bimire ev nikare bijî. Jiyan tim bi mirinê watedar dibe. Ji bo vê divê ku mirov van her du tiştan baş binirxîne.

Riya hezkirina jiyanê, îro di mirinê re derbas dibe. Wekî ku şehîdên rojiya mirina mezin jî digotin: "Em ji bo jiyanê diçin mirinê". Rast e, jiyan di mirinê de veşartiyê. Lê her kes nikare wê bibîne. Divê ku mirov bizanibe wê bibîne û bizanibe jê hez bike. Her kes di-

bêje: "Ez ji jiyanê hez dikim." Gelo çend kes dizanin ku jiyan çi ye? Qey her kes dikare mebesta jiyanê fêm bike? Ev ne tiştêkî wilo hêsan e ku her mirov têbigihêje. Berî her tiştî, divê ku mirov bi hestên jiyanê bê dagirtin û nîrxên jiyanê binase. Çi ne ev nirx? Azadî û serxwebûn. Bê wan jiyan ne bi dest dîkeve û ne jî biwate dibe. Belê di riya wan de hezar jiyan jî tên fedakirin. Mirov dikare bibêje navê jiyanê yê din "Serxwebûn û Azadî" ye.

Kesê ku ne azad be, nikare bi serbilindî bijî. Mirovê dil, berî her tiştî têkiliyên wî yê civakî dil tene girtin. Tew, îca ku dil û mêjiyê wî/wê jî dil hatibe girtin, ne gengaz e ku ev kes bikaribe bi vîna xwe bijî.

Kesê/a ku di riya serxwebûn û azadiyê de bimeşe, dê ew bi-xwediyê dil û mêjiyêkî azad û vîneke serbixwe. Tu hêz nikare ji jiyanê wî/wê re bibe asteng. Dê ew wekî teyrekî azad bi perî û baskên xwe bifire. Dê ew ji xwe re û ji bo xwe bijî, ne ji bo kesê din.

Êdî, mirov nikare ji ber xwe ve navêkî li jiyanê û li mirinê bike. Mirovek heye li tevî cihanê digere, di balafiran de li ezman difir, lê belê dil û hevalbendê mirinê ye. Mirovek heye, di nava çar diwaran de jiyanê diafirîne. Mirov heye, ji bo ku şêsthezar sal bijî rojêkê dimire. Bi rastî mirov dikare bibêje navê mirinê, "ixanet" û navê jiyanê jî "serkeftin" e. Mînak jî du kes in: Mirin Şemo ye. Jiyan jî Sema ye.

Piştî biryara hîlbijartinan kurd ketin rojeva partiyên rejîmê

Gelê kurd bi dek û dolaban naxape

Di van demên dawîn de ji ber nêzîkbûna hîlbijartinan partiyên siyasî ketine pey reyên kurdan. Raporan derdixin, federasyonê didin nîqaşkirin. Îro partiyên muxalefetê li aliyekî yên ku hikûmet in li aliyekî jî bo kurdan mesajên bêbinî sozên derewîn didin. Lê her kes dizane gelê kurd piştigriya kê dike.

Roja 11'ê meha gelawêjê ji aliyê CHP'ê ve raporeke ku ji du beşan (Mafên Mirovan û Demokratîkbûn-Rojhilat û Başûrê Rojhilat) pêk tê, hate belavkirin. Di raporê de li ser kêşeya kurd, hin formûlên ku berî vêga MGK'yê anîbûn rojevê, tîn pêşniyazkirin. Tu cudatiya vê raporê û yên din ji hev nîn e. Li gorî raporê kêşeya Kurdistan wê bi politikaya pêşveçûna aborî, civakî û herêmkî çareser bibe. Rapor xwe bi van yekan jî sînor nake, her wiha di raporê de tê diyarkirin ku prensîbên sereke yên sosyal demokratîk bûnê bîngeha 'Stratejiya Çareseriya Pîralî' ne. Mebesta CHP'yê ya rastîn di hevokên jêrîn de xwe bi awayekî zelal dide nîşan: "Sînorê Misakî Milli nayên nîqaşkirin û li hemberî terorê gav bi paş nayê avêtin." Wateya vê gotinê ji aliyê gelek rojnameger, ronakbîr û siyasatmedaran ve neyînî hate dîtin û hate daxuyandin ku ev bîrdoz, bîrdozeke

manbar e û dibêje: "Heke CHP tiştêkî bi vî rengî dixwaze, bila bibêje rengê vê rêveberiya xwecihî çi ye. Divê mirov vê yekê bide nîqaşkirin." Günel sîstema rêveberiya xwecihî wiha şîrove kir: "Di sîstema rêveberiya xwecihî de tu rayeyê didî rêveberên heremê. Lê belê tiştê girîng tu wan kesan bi ku derê ve girê didî. Dema tu saziyekê an jî waliyekî ku hatiye hîlbijartin, bi serokwezîr ve girê bidî, tiştêkî nayê guhartin. Ev pergal dê rê li ber qeyranên hê mezintir veke. Lê dema rayedarî bi temamî di destê rêveberên heremê yên ku bîna hîlbijartin de bimîne dê navê wê sîstemê bibe rêveberiya xwecihî. Lê îro ew çawa dikin, di bin navê rêveberiya xwecihî de rayeya wan kesan jî berê zêdetir dikin û mirovên xwe bi cih dikin. Ew jî bi dest talanê dikin. Hêza xwe jî ji wê rayedarîyê digirin."

Di raporê de li ser gelek problemên din jî hatiyê rawestandî. Tê gotin ku ji 75 salan vir de komara tirk xwe ji bin tesîra feodalîzmê rizgar nekiriye. Lê sedemên vê yekê nehatine diyarkirin. Gelek lêkolîner didin zanîn ku dema Kurdistan bi pêş biketa, dewletê nikaribû ziman û çanda kurdan wînda bikira û li Kurdistanê dewlet bi hêzên kevneperest re hevkarîyê dike, lewre bi taybetî hêzên feodal ji holê nayên rakirin. Dîsa heman kes bi bir dixin ku CHP danerê vê politikayê ye, îro CHP vê sîstemê ango vê lipaşmayîne rexne dike.

Li aliyê din hevgerîna di navbera politikayên CHP û MGK'ê de dibe sedema şik û gumanan. Wekî tê zanîn berî vêga bi demeke kin CHP'yê hemû kadroyên xwe birin Kurdistanê û xwest projeyê asîmlasyonê li ser jinên kurd pêk bîne. Di vê çerçoveyê de dest bi kampanyayan kir. Raya giştî hingî diyar kir ku armanca CHP'ê di bin navê propagandaya hîlbijartinê de, pêkanîna fermana MGK'yê ya ji bo marjînkirina tevgera kurd e.

Di civîna danasîna raporê de mebusê CHP'ê Algan Hacaloğlu diyar kir ku pêwîst e yên ku federasyonê dixwazin bikaribin xwe birêxistin bikin. Piştî ku biryara hîlbijartinê giştî hate girtin daxuyaniyekê bi vî rengî wekî nîşaneya daxwaza bîdestxistina rayên kurdan tê nîrxandin.

Kurd û PKK

Mixabin her kesekî ku navê demokratîyê bi pey xwe dixwe, problema Kurdistanê wekî kêşeya kurdan û kêşeya PKK'ê bi nav dike. Digel vê yekê PKK'ê û gelê kurd ji hev cuda dikin.



Hemû formulasyonên çareseriyê li ser vê bîngehê tîn danîn. Doğu Ergil yek ji wan kesên ku serkêşiya vî karî dike ye. Di nav wan de bê guman kurdan jî bi kar tînin. CHP'yê jî di vê rapora xwe de, hin tişt ji hev cûda kirine. CHP jî bo ku pêşiya 'terorê' bigire ji herême re ewlekariyê nû dixwaze. Dîsa li gorî CHP'ê PKK kêşeyê derveyî welat e, lê kêşeya kurd meseleyê navxweyî ye. Rûyê rastîn ê CHP'ê bi vê yekê baştir tê dîtin. Hêdî hêdî ber bi rastgiriye ve diçe. Muhlefeta nav CHP'ê pêşeroja wê temen kin dike. Ji ber ku kesên herî navdar ên ku CHP'ê li ser piyan dihelin Fikri Sağlar, Ercan Karakaş di nav partiyê de muxalefeteke resen dimeşînin. Ji ber politikaya partiyê Aydın Güvengürkan ji partiyê îstifa kir. Li gorî wan politikaya CHP'ê ya îro ji partiya MHP'ê bêhtir nîjadperest e. Bêhtir li gorî biryar û rêz û rêçikên MGK'ê dimeşe û ji partiyeke rastgir bêhtir artêşperestiyê dike. Ev yek di raporê de tê dîtin.

Li gorî amadekarên raporê operasyonên ku tîn lidarxistin tîr nakin. Ew digel operasyonan ji binî ve jîholêrakirina kurdan pêşniyaz dike. Ew dixwaze ku li Kurdistanê bi riya pîşesaziyê, kurdan bike wekî robot. Li aliyekî propagandaya projeya vegera gundan dike, li aliyê din jî di rapora xwe de diyar dike ku, pêwîst e li der û dora bajarên mezin ji bo koçberan avahî bîna çêkirin. Ew kes wê li der û dora bajarên mezin bîna bicihkirin, ji bo ku bikaribin bi hêsanî kurdan ji rastiya wan dûr bixin. Dema mirov bi awayekî giştî raporê û politikaya CHP'yê binirxîne ew dê têbigihêje ku CHP dixwaze bi kurdan rojên ji

dema damezrîna komara tirk hê dijwar-tir bide jiyandin.

İktîdar û muxalefet

Piştî vê yekê CHP'yê, li aliyekî iktîdar li rexê din jî muxalefet daxuyaniyên balkêş didin. Piştî ku partiyên muxalefetê di mala rojnameger Mehmet Barlas de gihîştin hev û li ser hîlbijartinan kurtepîst çêkirin, FP'yê der barê kurdan de daxuyaniyên balkêş dan. Ji bo ku reyên kurdan bi dest bixe Serokê Giştî yê FP'yê Recai Kutan diyar kir ku pêwîst e hin mafên kurdan bîna nasîn. Kutan nîqaşkirina van mafan jî dihêle piştî bêbandorkirina tevgera azadiyê. Serokê RP'yê Kutan diyar dike ku ew dikarin wê demê li ser mafê perwerdehiya bi kurdî û li ser mafê weşanê piştî wan yekan rawestin. Digel wê yekê jî niha ve li gorî ragihandinan FP dixwaze ku bi HADEP'ê re îtîfaqê çêke. Li aliyê din Wezîrê dewletê Salih Yıldırım jî diyar kir ku hikûmeta ANASOL-D sozên ku dane kurdan bi cih neanîne, ew ji ber vê yekê jî gelê kurd lêborîna xwe dixwaze. Her çiqas ev dîtin wekî yên şexsê wî bîna dîtin jî ev daxuyani li ser navê hikûmetê tê pejirandin.

Dîmena li ber çavan rewşa ku dewleta tirk tê de ye diyar dike. Partiya Refahê û CHP demeke dirêj li Tirkiyeyê iktîdar bûn. Digel vê yekê jî di warê kêşeya Kurdistanê de dûvekiya artêşê kirin. Lê bi nêzîkbûna hîlbijartinê re kurd û kêşeya kurdan kete bîra wan. Her wekî Bahattin Günel jî diyar dike gelê kurd hişyar û zana ye û bi dek û dolaban van partiyên naxape.

AZAD ALTUN



Algan Hacaloğlu

li dijî aştiya di navbera du gelan de ye. Bi vî nêzîktêdayîne aştiyê pêk nayê, ji sedî yekê pêşvekirinê mafên mirovan ji holê ranabin. Ji aliyê din ve CHP di her rapor û daxuyaniyên xwe de qala "Ji komikên etnikî re çareseriya demokratîk" dike. Gelo armanca wê ji vî gotinê çi ye? Raya giştî jî li bendeyî bersiva van pirsan e. Di gel vî yekê dîsa di raporê de hatiye gotin ku, CHP demokrasiyê herêmkî dixwaze, divê sîstema rêveberiya xwecihî bê danîn. Bi vî yekê gelek pirsên din derdikevin pêşberî raya giştî. Der barê vî yekê de Wekilê Serokê Giştî yê HADEP'ê Bahattin Günel pirsên Azadiya Welat bersivandin. Günel li ser helwesta CHP'ê gu-

Projeyên dewletên dagirker

Statûya Kurdistanê ya ku ji bi peymanên Qesr-î Şîrîn û Lozan heta roja îro dom kir, li ser binesaziya aboriyê jî bandor çêkir. Dewletên ku li ser Kurdistanê serdest in, zengîniya aborî ya erdê di nav tixûbên xwe de nirxandin. Bi projeyan hemû kanên dewlemendiyê bi kar anîn.

A-Iraq

Li herêma di bin destê vê dewletê de, bi piranî bikaranîna kanên neftê derkete pêş. Neftên Kerkûk û Musilê hem ji hêla hêsanbûna derxistinê ve hem jî ji hêla giranbuhabûn û potansiyelê ve kanên girîng in. Beşeke mezin ji vê neftê bi Xeta Borîyê ya Kerkûk-Yumurtalikê li bazara cihanê tê belavkirin. Di van salên dawîn de Iraq ji ber gelemşeyên ramyarî û aborî yê ku di encama qêrana Kendavê de rû dane, dixwaze bi xetêke di ser Sûriyeyê re nefta xwe bigihîne Derwaza Spî û li bazara cihanê xwe nîşan bide.

Iraq ligel neftê ji potansiyela enerjîyê, berên çandiniyê û ji keda mirovan bi berfirehî sûd wergirt. Wê dewletê bi riya bendavên (Barajên) ku bi piranî li ser çemê Dijleyê hatine avakirin ji veberhênanên (yatirim) ku li ser jêderkên enerjîyê û çandinê hatin kirin, qezencên mezin bi dest xistin.

Di warê aborî de jî sermayeya gureked bi kar anî, ji keda kurdan sûd wergirt. Ked û potansiyela karên ku di warê çandiniyê de hate bikaranîn wekî baregehên Teccema, di bin kontrola hêzên leşkerî de ma. Bi vî rengî aboriya Iraqê hêzên aborî yê li ser erdnigariya Kurdistanê hilda bin destên xwe, pêşveçûnan xwe ya aborî domand.

Veberhênanên pişesaziyê yê ku ji wan re teknolojiyêke bilind divê, piranî li Bexdayê û derdorên wê kom bûn, veberhênanên ku ji bo nirxandina darîngên xav (hammadde) pêk hatine li Kerkûk û Musilê hatin bicihkirin. Lê belê ji bo ku ev di bin dest de bimînin bi gurehî politîkayên pişafînê hatin meşandin. Li Kerkûkê bi hezeran gundî û bajarîyên kurd hatin koçberkirin. Li Musilê şênîyê ereb tê bicihkirin, kurdan dadixin asta kêmnetewebûnê û wan dipişîvînin.

B-Iran

Parçeyên Kurdistanê ku bi dest Îranê ketiye, li ser xeta bakur û başûrê Zagrosan e. Ew xwediyê warên stratejîk e û ji aliyê iktisadî ve herêmeke girîng e. Mêrg û çêregehên berfireh û zozanên bi adan (verîimli) ji bo sewalxwedîkirinê bi dest kesî nakevin.

Her sal bi hejmareke mezin sewal û berhemên sewalan tene îhrackirin û ji bo aboriya Îranê gelek dirav tene bidestxistin. Her wiha ji bo pişesaziya xwarin û çilagiye madeya xav bi awayekî hêsan û bi buhayekî erzan tê bidestxistin.

Îran ligel çewsandinê bi bikaranîna hestên îslamî ve dixwaze gelê kurd ji bi-

zavê bixe û desthilatdariya xwe ya li ser wî bidomîne. Bi 1993'yan ligel kuştina pênc hezar kurdî gelek serok û pêşengên gelê kurd bi dek û dolaban ji navê hatin rakirin.

C-Sûriye

Beşa Kurdistanê ya di bin destê vê dewletê de başûrê rojhilatê Kurdistanê ye. Ev herêm berdeewama deştên Heranê ye, çalakiyên çandiniyê yê Sûriyeyê li vir pir in. Li herêmên ku ava Firatê tê re derbas dibe, bi mebesta avdan û enerjîyê bendav hatine çêkirin.

Ev dewlet di van salên dawîn de ji ber kirinên Tirkiyê ketiye tengasiya avê.

D-Tirkiye

Beşa mezin a Kurdistanê di bin destê Tirkiyeyê de ye. Herêmên bakur, navrast, rojava li vir in û ji hêla aborî ve zengîniyên mezin di xwe de dihevin. Mêrgên berfireh; gihayên endustriyê, cihên çandiniyê yê ku sewzî û fêkî lê hêşîn dibin; maden, kanên enerjîyê yê ji bo pişesaziyê girîng in; her wiha çavkaniyê avê yê ku di çandiniyê de avdanê û di pişesaziyê de enerjîyê pêk tînin, potansiyelên surîştî yê sereke ne.

Çavkaniyên aborî bi xebatên birêkûpêk hatine dozandin û bi nirxandinan ew plan û pêşnûma hatine amadekirin. Dema aboriya bi plan dest pê kiriye û Kurdistan xwedîgiravî ketiye nava herêmên ku di pêş ve birinê de sereke (KÖY) ne. Saziyên dewletê yê wekî DİE, DPT, KÖY Daire Başkanlığı, TÜBİTAK, MPM, GAP İdaresi, DSİ, Köy Hizmetleri, TCK, MTA, EBK, TSEK, TPAO, TMO, TİGEM, Bölge Müdürlükleri, Kayısı Birlik, Güneydoğu Birlik, Devlet Üretim Çiftlikleri di warên xwe de lêkolîn û lêgerîn kirine, çavkanî dozandinê û ji bo ku ev bi kêrî aboriya Tirkiyeyê bînin plan û pêşnûma saz kirine. Di roja îroyin de hin guherîn hebin jî di bingeha xwe de heman çalakî didomin.

I-Neft, enerjî û lajwerdên din

Tirkiyeyê hetanî destpêka salên 90'yî pêdiviya xwe ya bi neftê % 80 ji Kurdistanê peyda dikir. Ji sedî şêstê ve neftê, nefta xeta boriyan a Kerkûk-Yumurtalikê ya ji başûrê Kurdistanê tê derxistin e. Ji sedî 20 ji bakurê Kurdistanê tê derxistin. Piştî Şerê Kendavê nefta ku di bori-



yan re dihat kêmbû, lewre jî dewleta tirk bi kamyonan edî neftê vediguhezîne Tirkiyeyê.

Lê belê ji ber ku ne wekî nefta xetên boriyan hêsan e û her wiha ji ber di riyan de kontrolên ARGK'ê aboriya Tirkiyeyê ketiye tengasiyê. Dîsa çalakî li Bakur hilberîna petrolê asteng dikin û li wir jî heman rewş xwe dide der. Tirkiye ji sedî 35'ê enerjîya ku tê xerckirin û ji sedî 50'yê enerjîya ku tê hilberandin ji Kurdistanê bi dest dixê. Nefta ku di veguhestinê de winda dibe, ne di nav vê rêjeyê de ye. Lê, vejena elektrîkê ya ku ji bendevan tê bi destxistin incax piştî ku %30'yê wê di xetên veguhestinê de winda dibe, digihêje metropolên Tirkiyeyê. Her wiha di veguhestina neftê de ji heman rewş derdikeve holê.

Dîsa ligel neftê, di warê kanên hesin de jî Kurdistan yek ji cihên herî dewlemend e cihanê ye. Tenê %70'yê kanên kromê yê Kurdistan û Tirkiyeyê li Elezîzê ye. Kanên sifir jî xwedî rezervên girîng in. Zêr, fosfat, gule, çinko, ûranîyûm, flûorût, megnezîyûm, potosîyûm, rijî, lînyîr lajwerd û vejenên din in. Her wiha madenên ku ji bo pişesaziya bine-saziyê divên bi tîra xwe hene. Vejenên rojê û biyomasê ku ji aliyê aborî ve hêja ne, hîn nayên bikaranîn.

2-Çandî

Gihayên endustriyel, zeviyên çandiniyê yê ku ji bo bi destxistinê sewze û fêkiyan bi adan in, hene. Ligel pembû ku ji bo pişesaziya tekstîla tirkan darînga xav e, dexil, titûn û tîrî bo malên xerckirinê yê pişesaziya tirk girîng in. Zerdalî, fîstiqên Entabê, alûç, mewij, berhemên beqla bo aboriya tirkan qezencên yekser ên malên hinardeyê ne. Ji bo bikaranîna wan ji hêla dewletê ve bi lez û bez kargehên tekstîl, titûn, eraq, arêma hatine avakirin.

Ji bo pawanên (tekel) ku li Kurdistanê ji aliyê dewletê ve hatine saz kirin û da-

nûstandinên berhemên çandiniyê dikin, Kayısı Birlik, TMO, Güneydoğu Birlik nimûneyên berbiçav in. Bi lîberalbûna aboriyê re van saziyan bêhtir bo kara bazirganî hewl dane, lê di vir de kesên hilberîner mexdûr bûne.

3-Sewalxwedîkirin

Li gorî îstatîstîkên DİE'yê yê 1994'an 16 milyon 829 hezar 20 mih, 3 milyon 709 hezar 650 bizin, 3 milyon 215 hezar 32 çêlek hatine tespît kirin. Li gorî îstatîstîkên van hejmartinên kêmbûnê çewt ji sedî 27'ê çêlekan û ji sedî 47'ê mihan ji beşeke erdnigariya Kurdistanê tene bidestxistin. Tirkiye bi riya kombîneyên EBK'ê, dezgehên hiriyê, saziyên Sümerbankê, kargehên TSEK'ê yê şîr û kargehên çermê ve potansiyela sewalan dinirxîne. Ev saziyên ku hatine arizîkirin (özelleştirme) bi piranî pêdiviyên artêşê yê wekî xwarin, lixwekirin û pêlavan bi cih tîne. Bi riya bazirganiya di sala de milyonan sewalan dişînin Tirkiyeyê.

4-Çewlikên hilberîna yê dewletê

Di sala 1944'an de bi mebesta sazîna çewlikên hilberîna yê dewletê 367 gundên li herêmê hatin valakirin. Gundî ji wê demê vir de nehatine bicihkirin û di rewşa koçberiyê de ne. Ji wan eşîra Bêritan navdartinê eşîr e. Çewlik li Rihayê, Wêranşar û deşta Serekaniyê li ser wareke ku ji 170 hezar hektarî pêk tê, hatiye avakirin. Şaxa çandiniyê li ser pişesaziya fîstiqên Entabê û zeytûnan; şaxa sewalan li ser xwedîkirina pêz û dawaran dixebite. Dema em tînan salên 1980'yî di çewlikan de 50 hezar mih, 2500 çêlek tene xwedîkirin, 2500 karker dixebitin, xwedî 142 traktor û biçer, 40 kewar, depo û dezgeh in. Her wiha saziyêke dewletê ya herî hilberîner e.

(Dê bidome)

Rêzimanê kurmancî

- Wane 25 -

SAMÎ BERBANG

Di lêkeran de avanî

Avanî ev tişt e ku, avasaziya kar nîşan dide; kar rasterast bi destê yekî pêk tê, an jî bi awayekî nerasterê pêk tê, tê de bireser heye an tune ye, kirde kar bi xwe dike an bi yekî din dide kirin. Di tirkî de jê re "çatı" tê gotin, di erebî de jî beramberî wê peyvê "bîna" tê gotin. Di zaravayê kurmancî de ji aliyê avaniyê ve lêker dibin pênc bir: Gerguhêz-negerguhêz, lebatî-tebatî û dançêker.

Di lêker de gerguhêzî

Her wekî berê jî li ser hatibû rawestandî, di lêkeran de gerguhêzî û negerguhêzî li gorî bireser (tiştê/obje) standî-nê diyar dibe. Heke lêkerê bireser bistîne, ew lêker gerguhêz e, lê heke nestîne negerguhêz e. Di kurmancî de gerguhêzî/ negerguhêzî gelekî girîng, lewre zaravayê kurmancî tewangbar e û di bireser û kirdeyên lêkerên gerguhêz de heye. Ji ber ku berî jî li ser vê mijarê hatibû rawestandî em dê zêde li ser rane-westin. Mirov dikare bi çend mînak dîsa bi bir bixe.

Elî nê dixwe. (gerguhêz)

Ez dimeşim (negerguhêz)

Hozanî stran gotin. (gerguhêz)

Baz difire. (negerguhêz)

Lebatî û tebatî

Dema yek rasterast karekî bike, lêkerê wî karî lêkerê tebatî ye. Yanê yek bibêje: "Min nan xwar." Lêkerê xwarin lebatî ye. Tê de kirde diyar e. Dema mirov pîrsa "kê" arestayî wê lêkerê bike, dê bersiva "min" wekî kirde xwe bide dest. Lê dema mirov bibêje: "Nan hate xwarin." Di vir de kirde nediyar e. Di vê hevokê de bireser li pêş e. Tiştê ku tê xwarin zêdetir derdive pêş, lê kesê ku wî karî dike diyar nabe, heke diyar bibe jî ne bi awayekî rasterê, lê bi awayekî nerasterast diyar dibe. Lêkerên tebatî bi alîkariya lêkera "hatin" tîne bidestxistin. Mirov lêkera "hatin" li gorî demê dikişîne û lêkera bingehîn jî di forma raderê de dide, avaniya tebatî derdikeve rastê.

Min (kirde) kevir avêt.

Kevir (bireser) hate avêtin (ji hêla min ve)

Zozan (kirde) tûyan diweşîne.

Tû (bireser) tene weşandin (ji hêla Zozanê ve)

Biro (kirde) av vexwar.

Av (bireser) hatiye vexwarin (ji hêla Biro ve)

Cerdevanan (kirde) dar birîne.

Dar (bireser) hatine birîn (ji hêla cerdevanan ve)

Di lêkerên lebatî de tiştêkî ku mirov zêde li serê raweste nîn e. Lê di lêkerên tebatî de çend xalên girîng hene. Her wekî balê dikişînin. Avaniya tebatî ji lêkerên gerguhêz çêdibin. Ji ber ku lêkerê bêbireser nikarin bibin tebatî, lewre di vê avaniyê de rista bireseran li pêş e. Tiştê ku tê serê yekî an tiştêkî derdikeve pêş. Dema mirov dibêje: "Dar hate birîn." Tiştê ku tê serê darê girîng e û dar jî bireser e. Lewre mirov nikare bibêje, "Çûk hate firîn" divê mirov pêşî lêkerê bike gerguhêz piştê bike tebatî. Awayê gerguhêz ê firînê, firandin e. Nexwe divê mirov bibêje: "Çûk hate firandin." Xaleke din ku wê mirov li vir bi bir bîne jî li ber rastnivîsa lêkerên tebatî ye. Ev cure lêkerê heke hevedudanî bin, her du hemanên lêkerê bi hev ve tene nivisandin.

Êdî em dikarin bi çend mînan dawî li vê mijarê bînin.

Xani hate hilweşandin.

Gund hate valakirin.

Xwarin hate sarkirin.

Mal hate avakirin.

Kar hate birêvebirin.

Ditin hatin gotin.

Lêkerên dançêker

Dema mirov karekî bi yekî din bide kirin, divê mirov lêkerên dançêker bi kar bîne. Lêker dançêker bi alîkariya lêkerê "dan" tê pê. Dema yek bibêje: "Ez mirovekî dikujim." Vî karî bi xwe dike, lê dema em lêkera "dan" li gorî demê bikişînin û bînin ber lêkera bingehîn û lêkera bingehîn wekî rader bi lîv bikin, avaniya dançêker derdikeve holê. Li gorî vê rêpîvanê hevoka li jorê dibe "Ez mirovekî didim kuştin."

Bozo xanî da avakirin.

Eyso kincên xwe dan şuştin.

Remezana miha xwe dide serjêkirin.

Dagirker li ser çemên me bendavan didin çêkirin.


Ezîz xwarina xwe li mala xelkê dide çêkirin.

Doza xwe bi xelkê dide pejirandin.

Her wekî ji mînan diyar e, avaniya dançêker jî bi alîkariya lêkerên gerguhêz pêk tîne. Lewre jî ne gengaz e ku mirov bibêje: "Hevalê min qesrek da çêbûn.", divê mirov bibêje: "Hevalê min qesrek da çêkirin." Her wiha lêkerên hevedudanî yê avaniya dançêker jî digel hev tene nivisandin.

Kajîn an ka jîn?

NEJDET BULDAN



Ev hem nav e, hem jî pirsiyar e. Li Kurdistanê "Kajîn" navê mirovan e. Mirov dikare wekî navê zarokan deyne Kajîn. Ji bo mîr û jinan gelek fêr nakete. Lê belê piranî navê mêran e.

Ka jîn? Pirsiyar e, pîrs e. Kanê jîn? Kanê jîyan? Jîyan li ku derê ye? Nav û pirsiyar di cih de ne. Mirov dikare herduyan jî bi kar bîne.

Sal hezar û heştê û heşt bû. Kurdên Başûr ji ber zilma Saddam reviyabûn. Li Helebçeyê dijmin bombeyên kîmyewî li ser gelê me barandibûn. Bi hezaran mirovên kurd hatibûn kuştin. Dîsa di heman salê de qirkirina Enfalê pêk hatibû. Nêzikî sedhezar kurd hatibûn kuştin. Ji ber van hovîtiyên dewleta Irakê, kurd koçber bûbûn û hatibûn herêma Geverê. Ji adarê heya payizê li Geverê di kampan de bûn.

Payiza Geverê gelek sar e. Mirov di

xaniyên xwe yê germ da îdare nedikir. Penaberên ku ji Başûr hatibûn di çadir û xîvetan dabûn. Payizeke dereng bû. Gelê Geverê serî li rayedarên tirk dan û penaber di nava seetekê de li malên xwe belav kirin. Bi qasî bîst hezar kurd ji mirinê xelas bûbûn. Hindek malên Geveriyên deh mirov mêvan kiribûn. Xudanên malan ji bo mêvanên xwe sobe berdabûnê û qedrê mêvanên xwe digirtin.

Li maleke ku jinek û şeş zarûyên wê lê mêvan bûbûn, xwarin amade bûbû. Ji na mêvan, dema hatiye ser sefrê zarûkên xwe hejmartin. Û bang li keça xwe kir:

"Pa keça min Jiyan, ka birayê te Kajîn li kî derê ye?"

Keça mêvanê jîyan jî li derdora xwe zivîrî. Berê xwe da odayên dîtir, belê dest vala hat. Û Kajîn nedît. Pir xemgîr bû. Dema dayikê zanî ku Kajîn li cem wan nîn e, çavên wê tijî bûn û got:

"Em li Kurdistanê Erakê ji Amêdiyê ne. Heşt salan berî niha zelumê min şehîd bû. Çend hevyan piştî hingî min kurek îna dinyayê. Loma ku babê wî şehîd û em jî gelek belangaz bûbûn, me navê wî dana Kajîn. Hem navekî kurdî bû, hem jî li ser rewşa me bû. Çend mangan (mehan) berî niha jî dema em ji ber kîm-

yasalên Seddam direvîn, kurê min yê herî mezin Dijwar, pê elxemekê (mayin) kir û ew jî di rê de şehîd bû. Niha jî dema em ji ber serma û befrê revîn, hatine vê malê Kajîn berze bû. Ev bawer nakem ku Kajîn berze (winda) bibîtin. Sedan sed xêrxwazekî ew biriye mala xwe. Ev bajêre bajêreke welatperêz e. Kajîn berze nabîtin."

Dayik gelek jî birçî bû. Pariyek ji xwarinê havête devê xwe. Cuya, cuya lê nikarî daqurtîne. Di gewriyê wê de ma û rondik ji çavan barîn:

"Belê, belê ez baş dizanim ku Kajîn berze nabîtin. Lê ez bawer im, heya mirinê em kurd dê bipirsîn. Emê bêjin kanê jîna me? Ka jiyana me?"

Di demê da çend xort derkeftin li malan geriyar. Çend kes jî bi telefonan li malên mêvanxudankaran pîrsa Kajîn kirin. Navbera du seetan da Kajîn peyda bû û hate cem dayik û malbata xwe.

Di wê salê de gelek zarokên li Geverê hatine dinyayê, navê wan bû Kajîn. Kajîn, ji bo gelek mirovan bû navekî paqij û kurdî. Û ji bo gelek kesan jî, bû sedema berxwedanê, xebatê û azadkirina welat, s da ku salên pêşiya me kurd nebêjin "Kajîn?"

Xwezginiyê azadiya Nûrheqê: Qomûtan Şêxo Dirlik

Piştî Cûntayê Hevalê Sebrî li welêt ma û lê têkiliya wî bi Partiyê re qut bû. Lê tevî vê rewşa nebaş jî Hevalê Sebrî berê xwe dide çiyayan û heta sala 1981'ê li ber xwe dide. Mixabin li ser îxbarekê di sala 1981'ê tê girtin û heta sala 1991'an girtî dimîne. Piştî berê xwe dide cem Serokatîyê. Her çikas wî li Ewropa wezîfedar dike jî, ew her tim daxwaza vegera welêt dike.



Şêxo Dirlik, tevî 18 hevalên xwe di sala 1993'an de li çiyayên Nûrhaqê bi çekên kîmyewî hate qetilkirin.

Ji bo ku mirov xwe ji tesîra dijmin rizgar bike, divê xwe ji bandora nîrxên civaka kevn bişo û xwe bi pêşerojê ve girêbide. Her wiha divê xwe ji fedekarî û gernasîyê nede paş. Ger pêwîst be, divê bêdudilî û bi dilgeşî berê xwe bide mirinê. Ji ber ku serkeftin bi vî awayî tê wergirtin.

Hevalê Şêxo Dirlik (Fermendar Hevalê Sebrî) di vî warê de mîna keke berbiçav e. Hevalê Sebrî û 18 hevalên wî, di sala 1993'yan de şeva sî û yekê tîrmehê, li Çiyayê Nûrheqê bi berxwedaneke gernasî dijmin anîn amanê û ketin nav refên şehîdan. Hevalê Sebrî û 18 hevalên wî, bi vê helwesta xwe, rîya ku gelê me rizgar bike, diyar kir.

Hevalê Sebrî li navçeya Gurgumê (Mereş) ya (bi navê) Pazarcixê ji dayik dibe. Li vê herêmê metîngeran, bi dek û dolaban kurd ji taybetiyên wan yên neteweyî dîr xistine. Her wiha ji ber ku kapitalîzmê jî li vê derê zû rû daye, kesayetiyan şikêstî derketine. Hevalê Sebrî jî ji van polîtîkayan bêpar nemabû. Ew, ji ziman û çanda xwe bûbû. Lê vê yekê tesîr li meşa Hevalê Sebrî nekir û wî bi hêrseke mezin berê xwe da nav refên şoreşê. Di salên 1978-1979'an de bi Partiyê re têkiliyên wî çêdibin. Wê demê têkoşîna şoreşgerên Kurdistanê tesîreke mezin li Hevalê Sebrî dike. Ji ber vê yekê di demeke kin de di warê îdeolojîk û siyasî de zanîna xwe bi pêş dixê û tevî refên şoreşê dibe.

Hevalê Sebrî dema li Edeneyê li

Lîseyaya Pişeyî (Yapı Meslek Lisesi) dixwend, ji aliyekî ve bi îdeolojiya Partiyê xwe bi pêş dixist û ji aliyekî ve jî di nav ciwanan de xebatên rêxistinkariyê dimeşandin. Li vir jî bi rabûn û tevgera xwe di nav şoreşgeran de bûbû qiblegeh. Her wiha wî, bi şoreşgeriya xwe tesîr li derdorên şoreşger yên din jî dikir. Wî, hem li dijî faşîstan xortên şoreşger dikîşandin nav têkoşînê û hem jî ji bo ku ciwanên welatparêz ji bin tesîra sosyal-şovenîzmê rizgar bike, xebat dikir. Bi vî awayî di warê sosyalîzm û şoreşgeriyê de Partî baş temsîl dikir.

Hevalê Sebrî, di sala 1979'an de dest ji dibistanê berda û li herêma Gurgum û Pazarcixê dest xebatê kir. Dijmin li ser vê herêmê bi awayekî taybet dişekiniya. Li ser mezheban dek û dolab digêrandin û rîya çûyina Ewropayê vedikir. Li aliyê din Hevalê Sebrî, li vê herêmê li dijî Têvgera Aydınlikê û sosyal şovenîstan jî têkoşîna da. Piştî Cûntaya 12 Rezberê wekî diyar e, gelek endamên Partiyê, bi talîmata Partiyê derveyî welêt. Vê demê Hevalê Sebrî li welêt ma û têkiliya wî bi Partiyê re qut bû. Di vê demê de baweriya gel ji bo têkoşînê pir

sist bûbû û her wiha hatibû çewsandin. Lê tevî vê rewşa nebaş jî Hevalê Sebrî berê xwe dide çiyayan û heta sala 1981'ê têkoşîna xwe didomîne. Bi vê têkoşîna xwe hêviya gel geş û xurt dike. Mixabin li ser îxbarekê di sala 1981'ê tê girtin û heta sala 1989'an de di girtîgehê dijmin de dîl dimîne. Lê di girtîgehê de jî Hevalê Sebrî bawerî û hêviya xwe her tim parast û bû xwedî kesayetiyeke serketî. Wî, li girtîgehê Mereş, Mîrsîn, Dilok û Edeneyê li dijî polîtîkayên dijmin her tim xeta Partiyê meşand. Tevî xedarî û zordariya dijmin jî Hevalê Sebrî xwe neda paş û her tim çav û guhên wî li ser bûyerên li welêt bûn. Daxwaza wî her tim vegera nav refên ser bû.

Fermendar Hevalê Şêxo Dirlik, piştî ku ji girtîgehê derket, di demeke kin de bi dilekî germ bi Partiyê re têkilî danin û xwe gihand qada Serokatîyê. Piştî ku perwerdehiya xwe qedand, her çiqas wî dixwest berê xwe bide eniya şer jî, lê Partiyê ew wekî berpirsiyarê Swîsreyê wezîfedar kir. Hevalê Sebrî li vê derê jî berê gel da nav refên têkoşînê û bi xebata wî, gelek ciwanan berê xwe dan çiyayên Welêt. Peyre ew derbasî Almaniyayê bû û di warê çapemeniyê

de wezîfeyên girîng pêk anîn. Lê li Ewropayê hewîna (sebra) wî nedihat. Di raporên xwe de daxwaza vegera Welêt dikir lê Partiyê ew daxwaz di cih de nedidit. Lê piştî ku xebatên kontray yên Terzî Cemal li Eyaleta Tolhildanê zerareke mezin li ser gel çekir, Partiyê jî bo ku tesîra van çalakiyan ji ser gel rake, daxwaza Hevalê Sebrî qebûl kir. Li ser vê yekê Partiyê di sala 1993'yan de ew şande herêma Tolhildanê. Wî, bi fermadariya xwe tesîra xerab Terzî Cemal ji ser gel rakir û hêviyeke mezin da gelê Tolhildanê.

Têkoşîna Hevalê Sebrî û hevalên wî, dijmin gelekî qehîrand û bi awayekî xedar û har di ser wan de diçû. Lê dijmin bi ser neket. Dawiya dawî bi awayekî dîrî ehleqê şer, ew û 18 hevalên wî di sî û yekê tîrmehê di sala 1993'yan de bi çekên kîmyewî ew qetilkirin.

Hevalê Şêxo, di jiyana xwe de her tim bi bawerî û zanabûneke mezin xebatên xwe meşandin. Di her rewşê de bû xwediyê îdia û hêviyeke mezin. Bi jêhatîbûn û çelengiya xwe di dilê gel û hevalên xwe de cihekî mezin û pîroz girt.

WELAT ŞÊXMÛS

Nûrheq

Were.

Were der ey keldûmana min.

Bes e bi ser hev de kom dibî diwerîmine cigêrên min.

Were

Û paqij bike lûleya gewriya min ji taliyê, ji gemara tîrsê.

Ji ser hev rake diranên min,

yên ku bi ser hev de hatine guvaştin.

Bila bes bimijîn xwîna hev du, her du lêvên min.

Were.

Were û bilivîne zimanê min,

vê ku hatibû hişkirin.

Bila bilivê û bibêje:

Dee... bes e Nûrheq

bes e Engîzek.

Bîne der wê hêrsa xwe

ya sedan salan.

Biteqe bi rûyê xayintiyê ve.

Bikuje bi hêrsa xayinên jînê,

û hambêz bike Sebrîyê dayika min.

Xwezginiyê azadiya te bû,

gulek ji yên zindanê,

Pêtek bû ji agirê Mezlûman

pelek bû ji pirtûkên berxwedanê.

De bes e Nûrheq

De bes e Engîzek.

Bi hêrsa xwe vemirine agirê napalmê

Biparêze Sebrîya dayika min.

Biparêze siwarên azadiyê.

Bes e Nûrheq.

BES E.

Hekîm Sefkan

□ 20-25 gelawêj 1982

Kongreya duyemîn a PKK'ê çebû


Kongreya duyemîn a PKK'ê li Bekavê hate lidarxistin. Bi darbeva 12 ve rezberê re PKK'ê miltanên xwe kişandin derveyê Welêt. Li dîv gelek xeberên zor û zehmet li Bekavê kongreya xwe ya duyemîn li dar xist. Di kongreyê de li ser vegera welat û destpêkirina şerê çekdarî sekinîn û biryar stendin.

BÛYERINE JI DÎROKÊ

□ 18 Gelawêj

Reşidê Kurd wefat kir

Reşidê Kurd di sala 1910'an de li Dêrika Mêrdîn hate dinê. Li Mêrdînê û Qonyayê xwend. Di salên mektebê de kete hepsê û ji hepsê reviya. Cara diduya wexta girtin fêhm kir ku wê wî îdam bikin. Carek din ji hepsê reviya, derbasî Kurdistanê Surî bû, li Amûdê bi cîh bû. Li wir jî çend caran hate girtin. Di sala 1968'an de, wefat kir. Şiirên Reşidê Kurd, Di nav şiirên kurdî de ji ayiyê naverok, tema û teknîkê ve cihêkî girîng digirin.

Şehîdên gelawêjê hatin bibîranîn:**"Lehengên çapemeniya azad"**

Roja 8'ê gelawêjê li Navenda Çanda Alêratîf panelek li ser Şehîdên Çapemeniya Azad ên ku di meha gelawêjê de şehîd bûne, hate lidarxistin. Panela bi navê "Ji duh he ta îro lehengên çapemeniya azad" ji aliyê rojnâmeya Ülkede Gündemê ve hate amadekirin. Di panelê de Bavê Ferhat Tepe İshak Tepe, diya wî Zübeyde Tepe, xwişka Cengiz Altun Sebahat Çelik û xebatkarên Ülkede Gündemê Müslüm Yücel, Menaf Avcı û Aydın Bolkan bîranînên xwe yên der barê wan de anîn zimên.

Li gorî Menaf Avcı kuştina rojnâmegeger û nûçegehîyanên kurd beşek ji pest û çewsandinên li ser gelê kurd bû. Avcı wiha got: "Dewletê du rê dabûn ber me, yek jê rîya xulamîyê ya din jî rîya mirinê bû. Lê hevalan rîya birûmet an jî rîya mirinê tercîh kir."

Menaf Avcı dîtinên xwe yên li ser şehîdan wiha anîn zimên: "Ez, Aysel û Ferhat di serwîsa îstîxbaratê de bûn. Ayselê di zanîngê de dixwend, em sê mehan li nik hev man. Aysel û Ferhat mirovên zor çalak û jêhatî bûn. Piştî demekê ez li Cizîrê hatim peywirdarkirin. Ayselê herdem ji min re telefon dikir, dixwest were herême û rewşa wê ji nêzîk ve bibîne."

Avcı di vê beşê de ji bo Ferhat Tepe jî wiha berdewam kir: "Di destpêka 93'yan de dest bi nûçegehîyanîyê kir. Wî dixwest xwe bigihîne, vegere herême û karê xwe li Bedlîsê bidomîne. Wî qet nedixwest li Stenbolê bimîne. Her wiha hevalan jî dixwest ku ew biçê Kurdistanê. Piştî du heyvan derbasî Bedlîsê bû. Ferhat mirovekî gelekî diltenik û mirovhez bû." Li gorî Menaf Avcı, dewletê ew mirov bi zanayî hilbijartin. Lewre ew, mirov gelekî aktîf û jêhatî bûn. Menaf Avcı di dirêjîya axaftina xwe de ev helsenang-


din kir: "Çapemeniya kurdan wekî neynika civaka kurdan e. Bûyerên ku li rojnâmeyan rû dan taybetiyên civaka kurd di hundirîn. Çawa ku di pêvajoya têkoşina gelê kurd de mirovin reviyân, hin bêalî man û hin jî hatin kuştin, heman tişt li rojnâmejê jî qewimîn."

Nûçegehîyanê Ülkede Gündemê yê Enqereyê Aydın Bolkan bi taybetî li ser Safyettin Tepe bîranînên xwe anîn zimên. Bolkan di destpêka axaftina xwe de got: "Ji bo pesindayîna van hevalan ez tu peyveke hejra nabînim. Safyettin tim digot 'ger ez herim Bedlîsê ez zindî venagerim.' Wisa jî bû." Bolkan wiha berdewam kir: "Ew di qereqola dewletê de bi awayekî êşkere hate kuştin. Dema ku em hatin girtin digot: 'Ez ê qet tişteki nebijim, her wiha ezê îfadeya xwe jî nedim.'"

Müslüm Yücel jî li ser nûçegehîyan û nivîskarê Welat û Özgür Gündemê Hüseyin Deniz, ku li Ceylanpınarê hate kuştin axivî û wiha got: "Hüseyin Deniz bi tenê rojnâmegeger nîn bû. Di heman demê de li ser ziman û çanda kurdî lêkolîn û lêgerîn dikirin, gotinên pêşîyan û çîrokên gelê berhev dikirin. Pênc zarokên Hüseyin hene û ew niha sêwî mezin dibin. Dema ku li Burhan xistibûn em du rojan digel hev li nexweşxaneyê nebedar bûn." Yücel wiha dawî li axaftina xwe anî: "Em tu car jî rîya xwe venagerin û emê rîya şehîdan bişopînin."

Di çalakiya ku bi peyama, xwendina helbestan domiya de ji NÇM'ê Koma Gulên Xerzan jî konserek pêşkêş kir. Di dawîya panelê de danîşana diayê ku ji rûpelên pêşîn ên Çapemeniya Azad û wêneyên şehîdan pêk dihat, hate pêşkêşkirin.

MEMED SERHEDÎ/ STENBOL

ÇAVDÊRÎ**Ji 15'ê gelawêjê û vir de**

MÎRHEM YIĞIT

Ji 15'ê gelawêjê û vir de zeman ji bo me kar dike, kete xizmeta me û ji her carê bêhtir ji me re misuxur bûye. Êdî deriyê jiyane li kurdan vebûye. Gelê kurd hatiye cihêkî, veger tune ye. Çawa mirovekî xort ne mimkûn e li zarokîyê û zarok ji li zikê diya xwe vegere, yê me jî êdî em piştî 15'ê gelawêjê wiha bûne. 15'ê gelawêjê dibe exlaq, dibe rabûn û rûniştin ango kultur. Mirov çendî behsa mezinahî û xweserîya vê rojê bike, kême û ne zêde ye. Girêdayî vê rojê rastiyeke din heye ku divê bi taybetî binav bibe. Yan dê rê ji xeletiyên re vebe. Ew jî ew siyaseta, îdeolojî û serokayetiya ye ku afirînerê vê rojê ye. Berê ji kurdan rahiştîye çekan, çima ew rahiştina çekan nebûye 15'ê gelawêjê.

Gava niha ez hewl didim li ser vê qewimîna mîladî çend gotinan binivîsim, muqayeseyek çêdibe di serê min de. 1) Berî Zayînê keşa agir ji bo mirovayetiya tê çî manayê. 2) Çapxaneya Jan Gutenberg hemleyeke çendî cehaletkuj û tariqelêş e. 3) Felsefeyên rasyonelîzma sedsala 17'an û wekhevîxwaziya sedsalên piştê çendî mirov berz û bilind kirine. 4) Nan, av, xwê, xew, xwarin û xweşûştin çendî ji bo însên pêwîst in, ji bo kurdên li ber sekerat û mesexbûnê, 15'ê Gelawêjê jî ewçandî derman û deriyê fereca xêrê ye. Bi rastî 15'ê gelawêjê destpêka gelek tiştan e. Kîlîta gelek deriyên civakî, kulturî, rewşenbîrî û ji nû ve avabûna însanê kurd, malbat û ezbeta kurd e. Berî 84'an gelê kurd tevîzî bû. Xewar û ne li ser hişê xwe bû. Qudumşkestî, bêqîram û behdilî bû. Jiyanê wî tewkelî û nîvmîrî bû, heçiyên wî şkestî û kuçên wî qulupî bûn. Bi gotinên lêkolîner û kurdnasên rojavayî, kurd goka pêlîstinê, neteweyeke bêşivan û bê ebûqat bû. Jiheketî û sedperçe bû. Ne yekîtiyê û ne jî tifaq hebû. Civat nexweş, psîkolojî xerabe, mantalîte û mêjî derxwarî û arqozkî bû. Kesî li kesî guhdarî nedikir, kesî ji kesî re xwedîtiyê nedikir. Hevdûgirtin û hevdûfêmkirin tunebû. Xelk bêhêvî û bixwenebawer bû. Kî di kare bête îro jî wiha ye. Na, ew gel çûye û yekî din hatiye. Ne tembelî û tiraletîya berê maye û ne jî sersarî, xof û dudulîya duh. Em bi gel û neteweyekî din re li hember hev in. Giş movikên civatê di nav guhartinê de ne. Têkiliyên nav jin û mêran ketine warekî din. Hest, his exlaq û kulturek din ava dibe. Giş bask û teyarên civatê gundî û bajarî, xezan û dewlemend xwe bi nuh ve dikin. Rewşenbîr ne mîna berê ne. Her komik û tebeqe hinekî hişyartir e, bêhtir organize bûye, ne bi temamî be jî hesab bi xwe re dibîne, û bi hişmendîyê pêşketîtiyê rojê xwe dubuhêre, meh û salên xwe dispêre hev. Bi kurtî îro şoreş heye li welatê me, serobin-hevbûneke heralî li dar e. Em bûne artêş, cebhe, partî û aliyên me yên baş ketine kar.

Di pazde saliya vê şoreşê de tiştê aktûel û ya tê xwestin ew e ku em divê felsefe, siyaseta û serokayetiya vê rojê baş binasin, dîraset bikin, hezîm bikin. Dê gelek şaş û nerast be, heger mirov li vê rojê bi tenê wekî roja rahiştina çekan binêre. Berî rahiştina çekan û teqandina çekan, ev siyaseta û felsefeya nû ye. Divê em wê tîxin her aliyên jiyane. Tiştê em giş jê fêr bibin hene.

Dawî. 15'ê gelawêjê bûyerê ku roja xwe cihê û heta bi welat û bi gelê xwe jî ne sînorkirî ye. Bandêr û kêra wê dê bi salan û dehsalan bimîne. Dibe destpêka jiyana û cîhanê nû li Rohjilata Navîn jî.

15'ê gelawêjê em fêr kirin ku em tiştên mezin bikin, tiştên mezin bifikirin û em xwe li tiştên mezin biqewimînin. Heger îro hinekî bêhna neteweyekî hevgerîtiyê ji me tê, em dikarin behsa yekîtiyê pêşketîtiyê bikin, dilê me bi ziman, dîrok û edebiyata me xweştir bûye û cîhan hew di kare me paşguh bike û nebîne, giş bi xêra 15'ê gelawêjê û serokayetiya wê ye. Her sala ku dikeve ser temenê vê rojê bi xwe re ji bo me diyarî û xelatekê tîne. Wêbê û rûmeta me gelekî girêdayî wê ye.

Salvegera Raperî

Ji nebûnê ber bi

"Seat li 21.27'an em ketin însaata li hemberî gazînoya leşkeran. Karkerê însaatê li odeyekê razayibûn. Me hemû hişyar kirin odeyekê de kom kirin. Tev di cihê xwe de sar bûbûn. Hevalek li cem wan ma û ji wan re propogandaya şerê çekdarî kir. Hevalên din, em derketin qata sisiyan. Wekî ku em û gazîno di nav hev de bin, em pir nêzikî hev bûn. Du serleşker jî bi okeyê dilîstin."

AMADEKAR: ALAATTIN AKTAŞ

Ji binê zemanan ve li "Bêndera Gelan" stêrk dixuricin. Mirov her li pey dîtina vê kêlikê ne, da ku xweziya dilê wan bi cih were. Lê xweziya dilê pir kesan ji hev cihê bû. Piştî demeke êdî li "Bêndera Gelan" li şûna stêrkan, gule xuricin û mirovan êdî xweziya dilê xwe li gorî guleyan bijart. Lê vê carê xweziya dilê her kesî yek bû. Ji wê rojê pê ve xweziya dilê kesî neguherî. Li gorî "çîrokên" binê zemanan, dema xweziya dilê her kesî yek be, wê teqez bi cih were. Îro jî gule dixuricin û xweziya dilan yek e. Gelên "Bêndera Gelan" vê rojê, destpêka roja xuricinê "guleya yekem" wekî "Rojbûna (Doğum günü) xwe" dihesibînin. Bila li wan û birayên wan pîroz be. Hûnê a niha guh li çîroka xuricinê "guleya yekem" bikin. Ka binêrin Siwarên Azadiyê çawa dijminê xwe basko kirine. Ev çîrokê kêlik bi kêlik tê vegotin.

Di dîroka hemû gelan de destanên gernasiyê hene û ev destan ji aliyê mirovên gernas ve, bi ked û xwînê tene nivîsîn. Ev destan, mezinahiya xwe ji mezinahiya armanc, nakokî û pirsgirêkên nava xwe digirin. Her wiha, armanc û pirsgirêk çiqasî mezin be, şerê çareserkerina wê jî ew qasî bedeleke mezin dixwaze.

Bê çawa Newroz di berbanga dîrokê de bûye mîlada azadbûn û dewletbûna kurdan, 15'ê Gelawêjê jî mîlada vejîna gelê kurd e. Guleya yekemîn di mêjiyê împeryalizm û mêtîngîriyê de, di serê kevnepereştî û xiyaneî de lê ya herî girîng jî di mêjiyê kesayetiya kurd a kole de teqiyaye. Ev raperîna mezin û dîrokî ji nişke ve û bi rehetî nehatiye pêkanîn. Di bîngeha wê de amadehiyên gelekî mezin û giran hene. Hetanî ev amadehî neyên fêmkirin, Raperîna 15'ê Gelawêjê nayê fêmkirin.

Amadehiyên Raperîna 15'ê Gelawêjê

Wekî tê zanîn, Serokê Neteweyî piştî ku derket derveyî welêt, dest bi amadehiyên Raperîna 15'ê Gelawêjê kir. Pêşiyê konferansa yekemîn hate sazîkirin. Di vê konferansê de pêvajoya têkoşîna berê ya 7-8 salan hate nirxandin, kêmasî, rastî û hewceyî hatin tespîtîkirin. Peyre ev kadro û mîlîtanên Partiyê, li ser îdeolojiya rizgariyê û pêvajoyê hatin perwerdekirin.

Li pey vê pêvajoyê, di dawîya gelawêja 1982' yan de kongreya Partiyê ya duyemîn civiya û biryara vegera welêt hate



Şoreşa Kurdistanê îro, sînorên ku împeryalist û mêtîngeran danîne hemû rakirine û her çar parçeyên Kurdistanê kirine yek. Ji çiyayên Silêmaniyê heta Behra Reş û Behra Spî, ji Koçgiri heta Efrînê, ji Erzeromê û Qersê heta Mehabadê û Hemedanê agirê şoreşa Kurdistanê pê dikeve û hêdî hêdî dibe şoreşa Rojhilata Navîn. Îro li Rojhilata Navîn siyaseta bîyê Tevgera Azadiyê bi hêsanî naye meşandin. Êdî gelê kurd ji nebûnê ber bi dewletbûnê ve bi çargavî rê digire.

standin. Li gorî vê biryarê pêşî komên kifşkar (keşif grubu) hatin welêt. Van koman, kifşa cografyayê kir û ji nû ve bi gel re têkilî danî, bi vî awayî bîngeha propogandaya têkoşîna çekdarî hate amadekirin. Lê mixabin, hinek kadroyên bîpîrsîyar, ku baweriya wan bi serkeftinê nemabû, li pêşîya van amadehiyan bûne asteng. Hinekan jî dixwest wekî çepgirên reformîst Tevgera Azadiyê bîkşînin Ewrûpayê û bikin penaber. Ji ber van rûdanan, Serokê Neteweyî jî bo destpêkirina raperîna leşkerî, ferman da Komîteya Navendî ya Partiyê û hem kêmasî û hem jî taktîkên pêvajoyê bi bîra wan xistin. Li ser vê yekê Komîteya Navendî dest bi amadehiya Raperîna 15'ê Gelawêjê kir.

Ji devê gernasîna çîroka raperînê

Em ê amadehiyên wê demê jî devê Ali Yılmaz pêşkêş bikin: "Wê demê Serok, ji hevalên di Serokatiya Teqfîkî de bûn re, ku li rojhilata Kurdistanê diman, fermana-

perîne başbaş nizanibûn. Lê pêwîstiya amadehiya çalakîyê ji wan re hatibû gotin. Bes heta 12 û 13 gelawêjê hevalan pê nizanibûn, wê çalakî kengê û çawa bê lidarxistin. Di 12-13 gelawêjê biryara Raperîna 15'ê Gelawêjê de bo hemû hevalan hate ragihandin. Li ser vê yekê hevalan ji kêf û çosê dikirin bifiriyana û kes di cihê xwe de nedisekinî. Lewre dilê hemûyan bi şahadeta Mazlûm, Xeyrî û Kemalî hatibû şewitandin. Tev jî li hêviya tolhildanê bûn. Dema behsa zîndanê dibû hemû kelogirî dibûn.

Li ser biryarê Hêzên Rizgariyê yê Kurdistanê, ku ji sê desteyên (takim) çekdar yê propogandayê pêk dihatin, ketin tevgerê. Desteya bi navê "21 Adarê" di bin fermanariya Abdullah Ekinci de berê xwe da Şemzînan û bi ser navçeyê de girt.

Desteya din ku di bin fermanariya Hevalê Egit de bû, ji 25-26 hevalan pêk dihat. Dema Hevalê Egit yeko yeko wezîfeyên me diyar kirin, ez gelekî hestiyar bûm. Di pirtûkên li ser şerê Wîetnamê de behsa Giap û desteya wî ya yekem dihat kirin, rewşa



Figûrên plansaziya hûrbînî desteya di bin (Eruh). Qersaqla dijmin vegirt, leşker di girtîniya Dihêyê propogandaya şerê çekdarî hatin meşandin. Dema behsa zîndanê dibû hemû kelogirî dibûn. Lewre Hevalê Egit yekemîn me diyar kirin, ez gelekî hestiyar bûm. Di pirtûkên li ser şerê Wîetnamê de behsa Giap û desteya wî ya yekem dihat kirin, rewşa

meyek şandibû û wisa gotibû: 'Diviyabû propogandaya şerê çekdarî di sala 1983' yan de bihata destpêkirin. Pratîka wê xitimîye. We raperîna bi salekê bi derengî xist. Divê bi raperîneke xurt pêşîya pratîkê bê vekirin...' Li ser vê fermanê li başûrê Kurdistanê di pûşper an tîrmeha 1984'an de bi Serokatiya Taktîkî re civînek hate çekirin û biryara Raperîna 15'ê Gelawêjê hate girtin. Her wiha Hêzên Rizgariyê yê Kurdistanê hate damezrandin û diviyabû bihata îlankirin.

Di vê demê de min û Hevalê Egit me li Botanê xebat dimeşandin. Dema me biryara Raperîna 15'ê Gelawêjê bihist, em gelekî kêfxweş bûn. Lê ev biryar bo me ne sîprîz bû. Ji ber ku Hevalê Egit jixwe berê pêşniyar li Serokatiyê kiribû û gotibû, em bi ser Goyanê (Uludere) de bigirin û şerê çekdarî bidin destpêkirin. Biryara şerê çekdarî li Botanê bêhtir bû cihê kêfxweşiyê û bi awayekî hûrbînî hate plansazîkirin. Kadro û şeravan bi biryara ra-

15'ê Gelawêjê: dewletbûnê ve

Di bingeha vê raperînê de amadehiyên gelekî giran hene. Hetanî ev amadehî neyên fêmkirin, Raperîna 15'ê Gelawêjê nayê fêmkirin. Wekî tê zanîn, Serokê Neteweyî piştî ku derket derveyî welêt, dest bi amadehiyên Raperîna 15'ê Gelawêjê kir. Pêşiyê konferansa yekemîn hate saz kirin û pêvajoya têkoşîna berê ya 7-B salan hate nixrandin. Peyre ev kadro û mîlîtanên Partiyê, li ser îdeolojiya rizgariyê û pêvajoyê hatin perwerdekirin.

Hevalê Egît jî wisa bû. Min di ber xwe de digot: "Vaye Giapê me û mufrezaya wî!"

Piştî plansaziyeke hûrbînî desteya di bin fermadariya Hevalê Egît de girte ser Dihê (Eruh). Qereqola dijmin vegirt, leşker dîl girtin û hemû çek desteser kirin. Peyre ji bo şênîya Dihêyê propagandaya şerê çekdarî hate kirin. Şênîya Dihê tev bi çöseke mezin li dora mizgeftê kom bûbû. Lewre Hevalê Egît bi megafonê propagandaya şerê çekdarî dikir."

Her wiha di heman demê de desteya bi navê "21'ê Adarê" di bin fermadariya Abdullah Ekinci de jî bi ser Şemzînanê de girtibû. Hevalê Rêzan jî yek ji çekdarên vê desteyê bû. Em dê serpêhatiya vê çalakiyê jî ji devê Hevalê Rêzan guhdarî bikin:

"12 gelawêjê Hevalê Abdullah Ekinci em li çiyayên Şemzînanê li hev civandin û

bir-yara da-me-zrandi-na HRK'ê ra-gihand. Wî got: "Divê em çalakiyekê ji bo damezrandina HRK îlan bikin, ku li hemû cihanê deng vede." Peyre desteya me bû sê ref. Em 21 heval bûn. Me sê hevalan herêma Şemzînan baş nas dikir, ji ber ku em ji Şemzînanê bûn.

Roja 15'ê Gelawêjê, danê êvarê em dîsa li hev civiyan. Hevalê Abdullah bi awayekî jixwebawer wiha axivî: "Em dê bi ser Şemzînanê de bigirin û danîna HRK'ê îlan bikin. Ev çalakiyeke dîrokî bila her kes hay ji

karûbarê xwe hebe." Peyre sê refên pêk hatî, wekî refa êrîşê, refa rêbirînê û refa parastinê hate diyarkirin. Her sê ref wê ji sê milan ve têketana Şemzînanê.

Dema tarî kete erdê, desteya me li daristanê xwe bo çalakiyê saz kir. Nêzîkî se at

vegerê bû. Me jî bi lez cîhê xwe terikand û berê xwe da çiya.

Îro ji wan rêhevalan gelek jê şehîd in. Hevalê fermendar Abdullah Ekinci jî di pêvajoya amadehiyên Kongreya 3'yan de, di sala 1986' an de şehîd ket."

Wekî me li jorê diyar kir jî HRK'ê sê destê hatibûn pêkanîn. Desteya sêyem jî de di bin fermadariya Terzî Cemal de bi ser Şaxê (Çatak) de bigirta. Lêbelê wî wezîfeya xwe bi cîh neanî û biryar di avê de bir. Di salên şûn de jî xayintî domand. Di hemû pêvajoyên raperînê de bi taktîk û hevalan dîlist. Hetanî 1993'yan bi vî awayî jî bo dijmin dixebitî. Di bihara 1993'yan de kontratî û sixuriya wî derket holê. Hinek sûcên xwe îtiraf kirin û dawiyê jî aliyê dadgeha şoreşê ve hatê ceza kirin.

Bandora Raperîna 15'ê Gelawêjê


Lê serdenegirtina Şaxê û helwesta Terzî Cemal jî li ber dengvedan û serketina Raperîna 15'ê Gelawêjê nebû asteng. Penga hevalan xweş reng girtibû! Encamên vê raperînê jî bêhempa ne ji bo neteweya kurd û gelên herêmê. Li ser vê yekê em dê guhê xwe bidin ser Ali Yılmaz:

"Berî her tiştî vê çalakiyê rastiya xeta Partiyê îspat kir û tevî vê, xetên reformîst û penaber mehkûm kir. Bi vî awayî li dijî Cûntayê bû bersiveke têr xurt. Ji ber vê yekê gelê Kurdistanê jî tamara mirinê rizgar bû û bi baweriyê mezin berê xwe da têkoşînê. Her wiha raperînê tesîreke gelekî erênî li endamên Partiyê kir. Ji ber ku gelek xedarî û zordarî li wan hatibû kirin, bawerî û hêza wan hinekî kêmtir bû. Lê piştî çalakiyê hemûyan bi dilekî geş doza Kurdistaneke azad kirin.

Encama herî girîng ev bû; ev çalakî bû bersiva têkoşîna li zindanan. Van hevalan tevî xedarî û îşkenceyên bêhempa, bi têkoşîna xwe bingeha vê çalakiyê danîbûn. Bi vê raperînê tola van hevalan jî hatibû hildan. Şoreşa Kurdistanê îro, sinorên ku împeryalist û mêtîngeran danîne hemû rakirine û her çar parçe Kurdistanê kirine yek. Ji çiyayên Silêmaniyê heta Behra Reş û Behra Spî, ji Koçgirî heta Efrînê, ji Erzeromê û Qersê heta Mehabadê û Hemedanê agirê şoreşa Kurdistanê pê dikeve û hêdî hêdî dibe şoreşa Rojhilata Navîn. Îro li Rojhilata Navîn siyaset bêyî Tevgera Azadiyê bi hêsani naye meşandin. Êdî gelê kurd jî nebûnê ber bi dewletbûnê ve bi çargavî rê digire.

Di dawiyê de divê bê gotin ku di bingeha van hemû pêşketinan de para herî mezin ya şehîdên şoreşê ye. Xeta serketinê xeta şehîdan e. Wan bi têkoşîna xwe riya biratiya gelên li Rojhilata Navîn vekir. Lewre êdî zarokên gelên herêmê jî di nav refên şoreşê de xwe diavêjin paşla şoreşê.

leşkeran bihata avêtin, dest pê bikira. Rocket, wê li seat 21.30 bihata avêtin. Refên yek bi yek ji hev veqetiyên û cihên xwe girtin. Ez di refê êrîşê de bûm. Seat li 21.27'an em ketin însaata li hemberî gazînoya leşkerên dijmin. Karkerê însaate di hundirê odeyekê de razayîbûn. Me hemû hişyar kirin û di odeyekê de kom kirin. Tev şaş mabûn û di cihê xwe de sar bûbûn. Hevalek li cem ma û ji wan re propagandaya şerê çekdarî kir. Hevalên din, em derketin qata sisiyan. Wekî ku em û gazîno di nav hev de bin, du leşkerên notirvan li devê derî bûn, em pir nêzîkî hev bûn. Du serleşker jî bi okeyê dîlistin, heya wan ji bayê felekê tunebû. Sê deqîqe wekî sê seatan dirêj bûbûn, qet derbas nedibûn. Bêhna me çikiyabû û kute kuta dilê me bû û di xwedanê de mabûn. Çavekî me li setê yek jî li dijmin bû. Di wan hersê deqîqeyan de hemû dîroka gelê me di ber çavê me re derbas bûbû. Êdî wextê tolhildanê hatibû. Bi xurmîna roketê û reqereqa çekan Şemzînan tev rabû ser piya. Dijmin jî li qula digeriya ji bo ku we tê de veşêre. Refekî hevalan jî li nav bajêr propaganda dikir. Êdî hemû refên me wezîfeya xwe bi cih anîbûn. Di nav tariya şevê de li hewayê du gule wekî çirayê pêketin. Ev îşareta



“Nehiştin em hînî zimanê wan jî bibin”

Her sal di nehê gulanê de li gundê Dêrîşê, çoş û lebateke gewre rû dide. Dîsa nehê gulanê bû. Dîsa li vî gundî bûbû halahala û qelebalixî. Wekî rojêke mihriçanê çûn û hatin zêde bûbû. Ji kesên nas û nenas, bi sedan kes hatibûn ser gora Şergo. Dîsa çoşêke germ li şênîyê gund ketibû. Ev ne wekî rojêke şînê, wekî rojêke şahiyê bû. Hûn dê bibêjin: “Ji bo çî ev qas kes tê ser gora Şergo?” Ji we re bi bêjim. Di vî rojê de Şergo li zanîngêhê, ji teref nîjadpe-restan ve hatibû şehîdkirin. Di ser şehadeta Şergo re pir sal jî derbas bûne. Lê hîn jî heval, hogir û gelê wî, ew jî bîra nekiribûn. Her salê di salvegera şehadeta wî de, hevalên wî yê zanîngêhê û hemû saziyên welatparêz û pêşverû tene ser tirba Şergo. Hemû gundên li derdorê û cîran jî tevî wan dibin. Bi merasîmê berê xwe didin ser goristanê. Ev roja ku em dê jê behs bikin jî yek ji wan rojan e.

Ewîl jî bo hemû şehîdan deqîqeyekê rêz hate girtin. Paşê helbest hatin xwendin. Piştê jî yek didu ji hevalên Şergo yê herî nêzik, li ser Şergo axivîn. Gel jî bi dirûşmên wekî “Şehîd Namirin!” li wan vedirandin. Qala lehengî û fêrisiya Şergo kirin. Dûvre jî gazî Xaltiya Besê kirin, da ku ji wan re behsa Şergo bike. Xaltiya Besê pir nizanîbû merama xwe bîne ser zimên. Lê pir mexrur û serbilind bû. Şewata kezeba xwe nedida der. Singa wê li pêş, devê wê bi ken û pir bi kêf û eşq bû. Ji şênîya ser goristanê re wiha digot: “Bila Welat sax be! Bila gel sax be! Ev tev Şergoyên min in. Me lawikê xwe şand dibistanê, ji bo ku ji xwe re hinekî serwest bibe. Hinekî hînî zimên bibe. Rojêkê, ku lê biqewime, da ku karibe cewaba xwe bide. Me nizanîbû ku wê nehêlin, em hînî zimanê wan jî bibin. A me ne şer û pevçûn e. Ku em li şer û pevçûnê bigeriyana, me yê lawê xwe bişandana cihekî dîtir. Me çima dişande dibistanê? Lê xwedê nehêle! Zikreşa xweziya me di zikê me de hişt. Xem nîn e, ez bawer im ku dê gelê me ji wan zikreşan, wî hesabî bipirse. Dê xwîna Şergoyê min li erdê namîne. Şergoyê min yek bû. Va bûye hezarî û milyona. Bila hûn tev ji min re sax bin.” Gel jî bi çepik û lîlandinê li dayika Şergo vedigerand û dirûşmên wekî “Şehîd Namirin” berz dikirin.

Wê rojê gelek pîrejinên gund, xweziya xwe bi halê Xaltiya Besê dianîn. Lê a ku herî zêde xweziya xwe pê dianî Xaltika Xezal bû. Xaltika Xezal jî wekî hemû gundiyan ketibû nav şênî û berê xwe dabû goristanê. Wekî rojên dîtir dîsa destê wê li ber rûyê wê û bi kul û keser di halê xwe de dinewirand. Qet beşera Xaltiya Xezal venedibû. Gava çûne ser mezêl jî, gel tev li ser gora Şergo civiyabû. Lê Xaltiya Xezal, bi tikî serê xwe ji mezêlê Şergo bi deh metro wir de li ser tirbeke axîni, ku hemû aliyên wê hilweşandibûn, rûniştibû û ji kûrahiya dilekî bi kul, ji kezeba şewitî digot û digirîya:

“Egîtê min lawo! Bêkesê min lawo! Bi dewê diya xwe behciya wo lawo! Bêxwedîyo lawo!. Ji kîsê dayika xwe çûyo lawo!. Mara pêvedayo lawo! De serê xwe rake vaye, mêvanê hevalê te Şergo hatine. Bê ka mêvanên te jî nehatine? Ma kanê hevalên te jî hebûn? Bi sedan bûn, bi hezaran bûn, bi milyonan bûn. Ordiya Dewleta Elî Osmanî bû. Kanê ew leşker û serzabitên bi pîrpirik. Ma me çî li ber Xwedê kiribû ku wer anî serê me, em bêkes, bêxwedî hiştin.”

Me xwe gihande Xaltiya Xezal û jê pirsî: “Gelo çî derdê Xaltiya Xezal hebû. Ev çî rewş û halê wê bû?” Ewîl nedixwest ji me re qal bike. Lê li ser wekilandina me Xaltiya Xezal derdê xwe vekir. Îcar, em ji devê Xaltiya Xezal li serpêhatiya Şergo û Egît guhdarî bikin:

“Her du jî di çaxa hevde bûn. Wekî du şêrê zozanan bûn. Ji herikî ew hatibûn dinê. Li gund em cîranê hev bûn. Erê erê! Min ji we re ji serî de negot. Ez ji Şergo û Egît behs dikim. Wekî hûn jî dizanin, Şergo lawê Besê, Egît jî lawikê min bû. Ji zarokên lawî ew tenê bû. Ku ez ne şaş bim, Egît bi du mehan ji Şergo mezintir bû. Heta deh diwazdeh saliya xwe wekî rih û canekî bûn. Bi şev û bi roj ji hev nediqetiyên. Rojê du caran, sê caran şer dikirin. Serê hev dişkênandin, lê dîsa jî ji hev nediqetiyên. Bêyî hev pariyek nan nedixwarin. Heta bîst saliyê û mirinê jî dîsa werê bûn. Xwedê hezkirina wan nedabû tu qûlên xwe.



Egît xortekî kin û qalind, eniya wî fi-reh, çavên wî hûr bûn, beşervekirî û devliken bû. Gava di ber mirov re diçû erd dilerizî. Porê wî xekek, çavên wî şîn bûn. Depê singa wî, wekî deriyê xanekê bû. Nava milên wî du gaz bûn. Mirov ji nihêrtina wî re heşmetkar dima. Her awireke wî wekî tîran bû. Hemû xortên gund xwe ji ber dixistin kadînan. Ez çî ji we re bêjim. Şergo jî ne kêmi wî bû. Xortekî zirav û dirêj. Çepîlên wê yê dirêj, dev û lêvên wî yê tenik, te digot, qey te ji hêkê derxistî ye. Ez çî bikim lawo! Xwedê ji sebeban re nehêle, herdu jî ji me girtin. Wekî ku mirov ji halê dilê xwe re çêke. Pir lawekî helîm bû. Kes jê tahl nedibû. Rojêkê xelkê dengê wî û kesî (hineka) nekir. Pir bêdeng bû. Lawo her du jî wekî lawê min bûn. Min ji herduwa jî wekî hev hez dikir. Besê carina carisî dikir jî lê min guh nedidayê. Ku bavê wî ji bajêr şekirek jî bi-anîya, min li herduyan par dikir. Jixwe min nekira jî wan li hev par dikir.

Herduyan tev de dest bi mekteba ewil kiribû. Piştî ku mekteb qedandin, bavê Egît ew neşande mekteba navîn. Go: “Ma tu bixwinî tu yê bibî çî? Jixwe nahêlin ku em bi bixwînan û bibin tiştêkî.” Heta eskeriya wî hat pê cot û cobar kir. Ew, şand ber kar û berxan, çilo û êzing pê dane berhevkirin. Lê bavê Şergo, bi rastî jî zilamekî zana û jîr bû, ne wekî yê me bû. Go: “Bila lawê min bixwîne. Belkî rojêkê ji me re lazim bibe. Qet ne-

be rojêkê di deriyê hûkûmetê de lê biqewime, dikare cewaba me û xwe bide. Em jî bi xêra wî dinyalika xwe nas bikin. Ew jî bibe mirov û insan, nebe gavan û şivanê xelkê.” Bavê Şergo, ew şand qezê li wê ew daye xwendin. Paşê jî çû dibistana mezîn. Bajarekî dût. Li wekî hûn dizanin li wir zikreşan Şergo kê min kuşt.” Belê. Lê derdê Egît çî bû? Çî lê qewimibû? Xaltiya Xezal ew nexwest bêje, di devê xwe de xumxumand. Lê li ser îsrar û wekilandina me dest bi vegotina serpêhatiya Egît kir:

“Ez çî bêjim? Ji ber ku me ew nedaxwendin, li gund ma. Dema emrê wî bû bîst salî, wexta leşkeriya wî hat, ji bona leşkeriyê gazî wî kirin. Ew bû aliyekî, ez û bavê wî jî bûne aliyekî. Wî digot: “Ez naçim, ji dijmin re leşkeriyê nakim.” Me jî got: “Xelasi jê nîn e. Kengî be, divê tu herî leşkeriya xwe bikî û werî. Heta mirov leşkeriya xwe neke nabe zilam.” Lê wekî jê re eyan bû, digot: “Ez naçim. Ew zilamtiya ku leşkeriya Roma Reş bide min, ez naxwazim.” Lêxist çû Anadolu. Nêzi salekê li çol û biyaniya geriya. Gava hate mal ez û bavê wî, em dîsa lê bûne agir. Bavê wî go: “Ku tu neçî leşkeriya xwe nekî, ez heqê xwe li te heval nakim. Ez ê te ji kuritiyê der bikim.” Rebenê min naçar ma ku here leşkeriyê. Nêzi du salan jî tiştê nebiribû serî. Lê ji ber me nekir der û bo leşkeriyê çû bajarê Îspartayê. Ji kerba me re nehate iznê jî. Lê her car ji me re name dişandin û digot: “Miraqa min nekin. Cihê min baş e.” Du meh jê re mabûn ku leşkeriya xwe biqedîne, teskerê bigire û were malê, piştî şehîtkirina rihmetî (Şergo) bi panzdeh rojan, me di rojêkê “Kaxeta wî reş hat”. Ê de Xezalê porkurê! Ez nabêjim, hûn bêjin. Ka ez çawa negirîm? Ka ez çawa li ser piya me û namirim. Hîna şehîtkirina Şergo jî nebihîstibû. Jixwe ku bibihîsta jî sax nedîma. Ya wê tola wî hilaniya yan jî dê har û dîn bûbûya. Gotin me, lawê we jî xwe kuştî ye. Hîn nû me fam kir ku Egît bi heq bû, ji bo neçûna leşkeriyê. Lê me dawî bi der da û êdî vegeer nabe. Vaye hûn dibînin. Ji roja ewîl û bi şûn de cenazê wî anîn, defin kirin û ew ro ye ev ro ye, kesî ne li Egît pirsîye û ne jî li me pirsîye. Bav ji kerban re, piştî wî bi sê mehan keribî û mir. Ez jî bi serê xwe tenê di qula hundir de mame. Bûme melkemot, ne dimirim da ji van derdan xelas bibim ne jî tiştêkî bi min tê. De bêjin, lawikê min! Ma ez negirîm dê kî bigirî? Şergo jî qedera wî wekî ya Egîtê min bû. Lê elhemdulah! Vaye hûn bi hezaran, wî bi bîr tînin. Hatine serdana wî. Lê yê me... Ne em ne jî Egît nayên bîra kesî. Bi dewê diya xwe behecî. Ne ji gundî û cîranan bûya, me nikaribû şîna xwe jî danîba. Lê Xwedê ji wan û Besê razî be, kul û derdên xwe jîbîr kirin, bi me de ketin.”

Q. DERSILAVÎ

Li Navenda Çanda Mezopotamya ya Stenbolê

Ji ber ku salona NÇM'ê hatiye mohrkirin hin çalakîyên xwe li navendên çandê yên din pêşkêş dike. Li gorî vê yekê vê hefteyê wiha ye:

● 15.08.98 şemî: Konsera Koma Amed li MED-KOM'ê, saet: 15.00

Li NÇM'ya İzmirê

● 15.08.98 şemî: Konsera hunermendên NÇM'ê, saet: 17.00

● 16.08.98 yekşem: Konsera Koma Şengal 'Ez gul bûm', saet: 18.00



Li Navenda Çanda Alternatîfê

● 19.08.98 çarşem: Filmê "Rewşa neasayî" derh: Costa Gavras, saet: 16.00

Li Navenda Çanda Tohum

● 15.08.98 şemî: Konsera Tija Sodirî, saet: 18.00

● 16.08.98 şexşem: Filmê 'Kerî' Yılmaz Güney, saet: 18.00

● 17.08.98 duşem: Filmê 'Kerî' Yılmaz Güney, saet: 18.30

● 18.08.98 duşem: Filmê 'Kerî' Yılmaz Güney, saet: 18.30

'Ji bo pirtûkxaneyê mafên mirovan dest bidin hev'



Roja 8'ê gelawêjê Komelaya Mafên Mirovan ji bo piştigiriya "Pirtûkxaneyê Mafên Mirovan" li "Açık hava Tiyatrosu"yê ya Harbiyeyê şevê li dar xist. Di şevê de Serokê İHD'ya Stenbolê Ercan Kanar der heqê pirtûkxaneyê de axaftin kir. Koma Çiya, Onur Akın, Suavi û Edip Akbayram jî stranên xwe pêşkêş kirin. Di çalakîya ku nêzî 500 mirovî beşdar bûbûn de salon bi pankartên durûşmeyên wêkî "Ji bo pirtûkxaneyê Mafên Mirovan dest bidin hev", "Efûyek giştî ya bê cûdatî", "Mirov bi mafên xwe mirov e", "Bo fikirîna Azadî", "Bijî biratiya gelan" hatibû xemilandin.

Serokê Şaxa Komeleya Mafên Mirovan a Stenbolê Ercan Kanar di axaftina xwe de li ser pêwîstiya pirtûkxaneyê sekinî û da zanîn ku ji bo pirtûkxaneyê ji rêxistina efûyê, sazgehên mirovperwer (hümanist) û ji pirtûkxaneyên mezin re name şandine û ji gişkan bersiva erênî standine. Dîsa Kanar da zanîn ku ji bo pirtûkxaneyê ji her cihî pirtûkan kom dikin, cih standine û dikin ku vekirina wê bigihijînin hefteya mafên mirovan a 1998'an.

Ercan Kanar wisa axivî: "Hûn jî alîkariya vê berhemê dikin. Em dê bi piştigiriya we, pirtûkxaneyê mafên mirovan diyarî 50. saliya Mafên Mirovan bikin. Em hêjahiyê didin xebatên bi vî rengî. Bi vê xebatê xebatên din jî ji aliyê parêzkarên mafên mirovan ve wê werin rojevê."

Her wiha Kanar li ser hikûmeta Tirkîyê û xebata Komeleya Mafên Mirovan a li ser efûyê sekinî. Wî hikûmeta niha şiband ên berê bi nav kir û da zanîn ew xelasiyê di hilbijartinê de dibîne. Kanar, wiha berdewam kir: "Efûyê dikin navgîna hilbijartinê. Divê efûyek bêcûdatî çêbibe. Bi vê yekê wê pence-

reyeke demokrasiyê vebe."

Piştî axaftina Kanar, Koma mûzîkê ya NÇM'ê Koma Çiya, Onur Akın, Suavi û Edip Akbayram konser dan.

İHD'ê ji bo Pirtûkxaneyê Mafên Mirovan namilkeyek weşand

Di namilkeyê (broşûr) de li ser pêwîstiya zanîna û tunebûna pirtûkxaneyê bi vî rengî li Tirkîyeyê hatiye sekinîn. Di namilkeyê de wiha tê nivîsîn: "Di welatê me de di warê mafên mirovan de sazî û weşanên ku xebatê dikin kêman in. Di vê mijarê de ne pirtûkxaneyek, ne ajansêk û ne jî weşanxaneyek me heye. Komeleya Mafên Mirovan Şaxa Stenbolê di vî warê de gaveke mezin diavêje." Her wiha di namilkeyê de der heqê naveroka pirtûkxaneyê de jî wiha tê nivîsîn: "Bi vê pirtûkxaneyê hûn dikarin çavkaniyên navneteweyî, dokûmanên Dadgeha Mafên Mirovan a Ewropayê bi hêsanî bi dest bixin." Her wiha tê gotin ku ji bo pirtûkxaneyê hedefa wan, di destpêkê de gi-



İHD diyar dike ku di pirtûkxaneyê mafên mirovan de hedefa wan, bidestxistina 10 hezar pirtûkên bi îngilîzî, almanî, frensî, kurdî û tirkî ye.

hiştina 2500 pirtûkên xwecihî, 1000 heb pirtûkên bi îngilîzî, almanî, fransî û pirtûkên kurdî ye. Her wiha balê dikişînin ser vê yekê ku ew dixwazin di sê salan de 10 hezar pirtûkî bi dest bixin." Di Namilkeyê de ji bo hemû perêzvanên mafên mirovan bang tê kirin: "Vê pirtûkxaneyê em bi hev re çêkin. Ji bo vê projeyê pêwîstiya me bi her cure alîkariya we heye. Alîkariya madî, arşiv, belgeyên di destê we de, wêne û çavkaniyên ku destê we bigihêje wan. Bi kinahî her tiştê ku hûn bi me re parve bikin. Em li benda we ne ku hûn ji bo van daxwazan bi me re têkevin têkiliyê."

C. ANDOK/STENBOL

TÎŞK

Kurdnasî



ŞÎRWAN REHÎM

Babetê kurdnasî ango kurdolojî, yekê e lew babete zor girîng û be derbestaneyê ke pêwîst e hemîşe be hend bigirêt û berde-wamîş lêkolîneweyî firawanî le ser bikrêt.

Le encamî hewlî bê pisanewe û mandûbûnî çend saley kewanî xemxor da, lem salaney diwayî da Zankoy Azadî Berlîn-Almanya qayil lira ke beşêkî taybet bo kurdnasî bikrêtewe û weku beşekanî tîr xwênkar werbigirêt û em babetey têda bixwêndrêt.

Beşî kurdnasî le zankoy nawbiraw êsta kewtote ser pê û be mebestî kurdnasî le Almanya serqalî sazdanî çalakî cêrengê.. Le encamî ew çalakîyaney em beşe sawaye da, ke hêsta temenîşî sawa ye, xerîke xoy dekat be yekê le nawende girîngekanî kurdnasî le derewey welat..

Lem çendaney diwayî da em beşî kurdnasiye le Zankoy Azadî Berlîn konferansî be beşdarî gelêk zana û şaraza saz kird, amadebi-wan zêdetir hestiyar be girîngî em lêkolînewane û be hend girtinî nasîna kurd dekir.

Konferansî kurdnasî em salî Zankoy Azad "le jêr nawnîşanî lê nêwan endêse û berperçdanewe" da bû, sê rojî xayand. Herweha qise leserkirdin û têraman lewey ke çon kurdan le rewşî xud (subjekt) ewe berew babet (objekt) deperênewe..

Perînewe kurdan le rewşî xudewe berew rewşî babet le pay ewe da ke mijarî girîng le prosey mêjuyî xoyan da berceste biken, yekê bû lew babetaney ke mebest û amancî lêdwan bû.

Diyar e kurdnasî dûlayî ye û herdû lay erênî û nerênî heye. Beşêk lew Rojhelatnasaney ke kurdiyan nasîwe, ser be dagîrkaran bûne û le katî dagîrkirdin da Kurdistanyan bîniwe. Ewane ke çûnete Kurdistan endamî serdestan bûne û her lew rwangeyêşewe temaşay meselekanyan kirdiwe û helynasengandin. Helbete em nek tenha nirxî kurdnasî, belkû nirxî raportêkî îstixbaratîşî niye..

Diyare hemû ew şitaney ke le layen rojhelatnasanewe nusrawin (ke eme zorbey nusînekanî diwênêy kurdnasî pêk dênin) debêt zor be wirdî û westayane kelkî lê werbigirêt, çunke herçendêş şitî gelê degmen û nayabiyan têda ye, hawkat şitî gelê çew û nacorişyan têda ye. Belê dekrê tenha sûd lew karane werbigirêt ke Kurdnasanî biyanî le çwarçêwey karî zanistî da be encamyan geyandiwe, nek le çwarçêwey pawanxwazî siyasî û şitî be tem û nij dapoşraw da..

Ewey lem konferanse da aşkira bû ewe ye ke, îtir xelkanêkî zanistkar hen ke rêga be zanist wêl naken, kurd wekû xoy û dagîrk-eranî Kurdistaniş weku xoyan debînin û denirxênin. Zanistkarani biyanî rastiyekekanî jiyani kurd debînin û raşikawana le lêkolînewey xoyan da amaje bew hemû bédadiye deken ko beranber be gelfî kurd derkêt..

Xelîlê Ciwan

Têlî Eysan jî ev heft sal in çavên wê tim li riya Xelîl in. Eysan radibe derdikeve derve gava bala xwe dide rê, qefle bi qefle siwar û peya bi rê de tîn. Eysan bi çar çavan li qefleyên siwar û peya mêze dike ku tev leşker in, ji xwe re dibêje: "Ezê xwe berdim ser rê, pîrsa Xelîl ji wan bikim." Careke din difikire ji xwe re dibêje: "Ku ez herim pîrsa Xelîl bikim wê xelk bibêje, 'Eysan qîzeke çiqas bê şerm e. Xwe berî ser rîyan dide, pîrsa dergistiyê xwe ji rêwîyan dike.'" Dîsa difikire dibêje: "Heyran wele çawa bibe ji ezê xwe berdim ser rê, pîrsa Xelîl bikim", Eysan xwe berî ser rê dide û carekê deng li siwar û peyayan dike. Wiha dibêje:

*Were lo lo, were lo lo, were lo lo lo,
lo birano dilê min li yan e,
ezê li bejna we mêze dikim bejna we mîna bejna leşkeran e,
girêdana we girêdana şûr û rîman e,
ka hûnê qumandanê xwe ji min re bidin nîşan e, ka qumandanê we kîjan e.*

Gava Têlî Eysan dibêje van kelîmanan, temami xortan digirîn, li nava çavên xwe didane, dibêjin xwişkê tu ji me neke van pîrs û kelîmanan, wele bi Xwedê qumandanê me ne di nava me de ye, lê derketiye derdekî bêderman e, ew îro maye li welatê xerîb li ser kaniya Xeznegole bîxwedî û bîxwedan e.

Wê çaxê Eysan fêhm dike ku êdî Xelîl ne di nava wan de ye û radibe ji paş ve dizivere tê derî malê. Bala xwe didê dayika wî li ber derî rûniştîye, dibêje: "Gelo ez jê re bibêjim an nebêjim. Ger ez jê re bêjim ewê bêje qîza min çiqas bêsel e, qet şerm û eyb di rûyê wê de nemaye, hatiye cem min behsa dergistiyê xwe dike." Eysan dike nake xwe zefî nake, gazî dayika xwe dike û jê re wiha dibêje:

*Lê lê dayê, sibe ye serê min dêşe dilê min ji dila dilekî dîn e,
Ezê di darekî li derî mala bavê min hêşîn bûbû, du heb sêv li serê qetiyabû û safîrî ne,
Yeqîn lawê apê min mirî ye, sax nîn e.*

Dayika Eysanê dibêje: *Qîza min lawo tu xewna nebîne di xewê de, Xwedê wê lawê apê te bi sax selamet bîne, mirazê we herduyan biqedîne li dinê de.*

Wê çaxê Eysan xwe ker dike, diçe malê rûdinê dibêje: "Wiha nabe." Radibe di nava bajêr de çil heb qîzên hevalên xwe li hev kom dike, rewşa dergistiyê xwe ji wan re dibêje. Ew ji jê re sond dixwin û dibêjin: "Em ji heya mirinê bi te re ne." Têlî Eysan û tevî qîzên hevalên xwe radibin her yek qatek çekên mîran li xwe dikin, her yek li hespekî siwar dibe û bi şev dikevin rê. Pêda pêda dikevin Kerkûkê, Mûsilê, Hemîsê, Hekayê, Silêmaniyê, Bexdayê digerin tîn dertên li Serkaniya Xeznegolê. Li ser kaniyê digerin-nagerin Xelîl nabînin. Wê demê Têlî Eysan destê xwe vedike, berê xwe dide ezmanan û ji Xwedê re dia dike û diqîre wiha dibêje:

*Heyran komê qîz û bûkan ma eva kaniya Xeznegolê yo,
Ezê wisa biqîrim bila dengê min mîna qulînga here erşê ela ba Xwedê yo,
Belkî ji teref ba Xwedê de melaiketêk were bêje cihe lawê apê min ka li kê derê yo.*

Ev digerin nagerin Xelîl nabînin, rûdinin bi ser hev de digirîn. Dema ku Xelîl nexweş e, li ser kaniyê di holika xwe de ye, du heb

xort tîn ser kaniyê dema ku avê vedixwin, bala xwe didinê mirovek di hundurê holikê de nexweş e û pir bêhal e, radibin wî nexweşî hildidin dibin mala xwe.

Eysan jî tevî qîzên hevalên xwe li hespan siwar dibe da ku werin Amedê. Pir tîn hindik tîn ku werin perê gundekî, bala xwe didinê ku li perê gund qesreke li ser bîst û çar rexsan çêkiriye, sê heb xort li ber derê qesrê rûniştine, destê wan li ber rûyê wan e û bimedê ne. Eysan dibêje: "Heyran bi Xwedê di van xortan de tişteke heye." Ji hevalên xwe re dibêje: "Em bajon ber derê qesrê." Li ber derê qesrê sekinî silavek da xortan û xort silava wî vedigirin. Eysan dibêje xortan: "Hûn mêvanan xwedî nakin?" Xort jî dibêjin: "Ser seran û ser çavan, lê birîndarek di mala me de heye, birîna wî xedar e û bêderman e, hûn ji xortên nazik û heyrîn, ditirsin em we xwedî bikin hûn jî bi wê nexweşiyê bîkevin." Wê demê Eysan fêhm dike ku ew nexweş, Xelîl e. Ji wan re di-



bêje: "Ez bi qurbana we, çima hûn li ber xwe nakevin û çima li ber me dikevin, ma qey em ji we çêtir in?" Gava Eysan wiha dibêje xort jê re dibêjin: "Kerem ke were hundur." Têlî Eysan bi derenceyên qesrê ve hilpas dibe, deriyê qesrê vedike ku Xelîlê Ciwan di nava nivînan de ye. Eysan dibêje: "Eselamul eleykum" û diçe li ber serê wî rûdinê, bi destên wî digire. Xelîl jê re dibêje: "Xorto destên xwe ji nav destên min derxe, ez nexweşekî bêderman im, destê xwe ji nav destên min derxe, wê nexweşiya min bigihêje te jî, tu xortekî heyfî." Eysan jê re dibêje: "Ez bi qurbana te û birîna te bim, ma qey ez ji te çêtir im?" Xelîl jê re dibêje: "Xorto tu çiqas xortekî başî, gelo tu ji kî derê yî?" Eysan jê re dibêje: "Ez ji Amedê me." Xelîl dibêje: "Wey, birîna min êşiya, te mala min xera kir, gelo tu ji Amedê Walî Kêrman Beg nas dikî?" Têlî Eysan dibêje: "Belê, ez baş nas dikim", Xelîl pîrs dike û dibêje: "Gelo qîza wî Têlî Eysan hebû gelo çawa bû?" Eysan jê re dibêje: "Hê di mal

de sekinî ye. Xelîl dibêje zavayê wî Xelîlê Ciwan hebû, gelo ew çawa bû. Eysan dibêje ew çûye şer hê nehatiye. Xelîl dibêje wey xorto, te kezeba bin şewitand, birînen min êşand, gelo tu qet kilmekê nizanî ji derdê dilê min re bêjî? Eysan jê re dibêje bi xwedê ez dizanim. Xelîl dibêje de ji kula dilê min re bêje.

Eysan dest pê dike û wiha dibêje:

*De were lolo, de were lolo, de were lolo,
lo pismamo, dilê min di halê dilê min de yan yan, kale kale. De çima hevalê lawê apê min tev zivirîn hatin mal e, ezê çûm pêşiyê minê gotî Xelîlê Ciwan lawê apê min kanê, temamê hevalên te bi min re girîyan kirin nale nal û zare zar e. Gotin bi Xwedê lawê apê te li ser kaniya Xeznegol e, nexweşekî pir bê hal e.*

Ezê rabêm min ê çil qîz bi xwe re kirî siwar e, ez dara şikestî digeriyam li zozanan, li welatan, li bajaran war bi war e, lê gava min lawê apê xwe didî, min dit ku birîndar e, birîna wî pir xedar e.

Xelîlê Ciwan cardin wê nas nake ku ew dergistiyê wî ye." Dibê: "Xorto qurbano ka tu bêje, tu çiqas xweş dibêjî."

Têlî Eysan dîsa dest

"Xorto ka tu çiqas xweş dibêjî bidomîne ji min re dîsa bêje."

Eysan dest pê dike dîsa dîsa dibêje: *De were lolo, de were lolo, de were lolo, lo pismamo,
Wezê qemîş nakim deng lê bikim pismamê xwe ji xew rakim,
Ezê deng lê kim ji xew hişyar bikim,*

Bi banga melê sibê re, bi dengê dikên paşivê re, bi bilûrên şivanên serê çiyê re, bi hokîna bazirganê serê rê ve, bi şingîna şûre kurda ve ezê deng lê bikim lawê apê xwe ji xew rakim, minê çil qîz bi xwe re kirine siwar, ezê siwar bikim, ezê bi siwarî çemê Firat û Bêlecûkê bi siwarî bi qamê xilas bikim,

Ezê genc Xelîl bibim Amedê, cotek qon-dirê Amedê bi linga kim, ezê ebakî Hesroyî di mila kim, ezê li kêleka wî rûnim birînen dilê wî derman kim,

Ger dema derman nebû, ezê şûrekî bînim serê xwe jêkim xwe bi qurban kim.

Wê demê Xelîl Têlî Eysanê nas dike, ku Têlî Eysan dergistiya wî ye, çekên mîra li xwe kirine hatiye ji bo wî. Wê demê dibe kurîniya Xelîl dilê wî dişewite û digirî. Gazî Têlî Eysanê dike wiha dibêje:

Weyla Têlî Eysanê, bi eslê qîza Kêrmanê, tu ji bo birîndarê mala bavê xwe ji bajarê Amedê derketî hatî welatê Besrayê, wele bi xwedê birîna birîndarê mala bavê te kîr e, bêderman e. Lê Eysanê minê bihata şerê kurdan û ereban bikira, minê bajarê ereban ji bo kurdan fetih bikira, ezê nexweş biketima bimama li vîra, tu qîzî dara şkestî yî, tu yê rabûya ji bo min li bajaran û zozanan bigeriyayî war bi war e, lê bila ez bimirama tu qîzî dara şkestî yî ji Amedê bila tu nehatibûya vîra.

Eysan dest pê dike û dibêje:

Xelîlê Ciwan tuyê negirî nenitrîne, tuyê kezeba min neşewitîne, înselleh Xwedê wê mirazê min û te biqedîne.

Têlî Eysan û hevalên wê radibin Xelîl bi xwe re siwar dikin berê xwe didin Diyarbekirê. Di rê de Xelîl pir zêde bêhal dibe, Xelîl dibêje: "Min peya bikin."

Eysan radibe Xelîl li devê avekê peya dike, ser çavên Xelîl dişo. Xelîl dibêje: "Eysan êdî ez dimirim, tu rabe ji min re çayek an jî qehweyekê çêbike, êmin ez dimirim bila ew hesretî bi min re neçe gorê."

Eysan radibe daran kom dike, agir dadide, li ser agir avekê dikelîne, ji Xelîl re qehweyekê bi destê xwe dikelîne, gava ku Eysan şûşekî qehweyê dide Xelîl, Xelîl gurmek li qehwê dixê, piştî vexwarina qehwê Xelîl dikeve ber sekeratê. Eysan digirî û gazî hevalên xwe dike û wiha dibêje:

Komê qîz û bûkan ji eyda heya eyda erefatê,

*Sibe ye Xelîlê Ciwan ketiye ber sekeratê,
Ji bedena wî xwêdana germ û sar tê,
Her du çavên wî ketine wefatê.*

Lolo Xelîlê Ciwan pismamo devî rabûne dibêjin: "Em çiya ne", golikê nava garanê serê xwe bilind kirine dibêjin: "Em ga ne", sibê xortê nava Amedê ew ê her yek qatek çek li xwe bikin tizbiyekê bidin destên xwe li ba bikin, werin li cem min rûnin bêjin: "Eysan emjî wekî Xelîlê Ciwan axa ne."

Têlî Eysan dizivire ser hevalên xwe, dibêje: "Ez li pey mirina Xelîl re li dinyayê êdî sax nagerim û tu xortî jî nastînim, ezê xwe li vîr bikujim, hûnê cenazeyê min û cenazeyê Xelîlê Ciwan bibin Amedê defin bikin." Eysan soraniyê ji ber xwe derdixê, li serê dilê xwe dixê û xwe dike. Hevalên wê radibin cenazeyê herduyan hildidin tînin li Amedê defin dikin. (Dawî)

BEREVKAR: SERVET YÜKSELİR

Hejmara 22'yan a Jiyana Rewşen derket

Kovara xwerû bi kurdî ya çand û hunerî Jiyana Rewşen, bi hejmara xwe ya 22. gihîşt ber destê xwendevanên xwe. Di vê hejmara kovarê de nivîsa Medenî Ferho ya bi navê "Gotina "Roman" navê zimên e" bi navê roka xwe balkêştirin nivîs e. Ferho, pêwîstiya bi kurdî nivîsînê aniye ser zimên û kesên ku girîngiya zimên di serguhê xwe re diavêjin, bi şeweyekî tund rexne kirine.

Di vê hejmara Jiyana Rewşenê de gotar, kurteçîrok, helbest, stranên gelêrî cih digirin. Her wiha di vê hejmarê de bo dilên şer ragihandinek heye. Bi pey agahiyên berpirsiyarên kovarê, dê ew hejmara 24. ya kovarê bo nivîsên dilên şer terxan bikin. Ji ber vê çendê ew daxwaza nivîs û gotaran ji dilên şer dikin.

Wêje bûye nasnameya gelan

Wekî ku li jor jî hate diyarkirin, nivîsa Medenî Ferho ya bi navê "Gotina Roman navê zimên e" di vê hejmarê balkêştirin nivîs e. Ferho di vê nivîsê de girîngiya zimên ya bo romanê û rewşa romanivîsên kurd nixandiyê. Bi bawerîya nivîskarê kurd, her çiqas di warê wêjeyî de curenivîsên herî girîng roman û ceribandî (deneme) bin jî, nivîskarên kurd herdu cureyan jî bi delalî bi kar neyînin. Ferho wiha nivîsiye: "Wêjeya kurdî li ser piyên xwe ranewestiyaye û nebûye xwedî nasname. Ne hewce ye em xwe bixapînin." Her wiha Ferho, nivîskarên

kurd ku dil dikin bi zimanê tirkî wêjeya kurdî ya nûjen biafirînin, bi şeweyekî tund rexne kirine. Wî, ev helwest bi nivîskaranev

girêdayedaye. Medenî Ferho, li ser vê yekê wiha dirêjî bi nivîsa daye: "Çarenûsa sedsala bîst û yekan bi destê gelê kurd tê nivîsandin lê çîna bijartî ya kurd di vê çendê negihîştîye. Romanivîsên me di nava sê sed û çar sed rûpelî de newêrin navê Kurdistanê bînin ser zimên."

Di dawiya nivîsa xwe de Medenî Ferho bal kişandiyê ser dewlemendiya wêjeya devkî ya kurdî û daye zanîn ku wêjeya devkî ya kurdî dikare wêjeya nivîskî ya cîhanê bikişîne û pê re bikeve tiratê, hu piştê dibêje: "Mixabin bêxwedî ye." Di dawiyê de Ferho gotiye, çîma nivîskarên kurd digel têkoşînê nêşin. Bi dîtina wî, wêje

nasnameya gelan e.

Di vê hejmarê di nivîsa Çiya Mazî ya bi sernavê "Di pêvajoya dîrokî ya nêzik de jiyana jinên kurd û wêje" jî hêjayî xwendine ye. Mazî, bi alîkariya stranên



gelêrî, rewşa îro û berê ya jina kurd hevber kiriyê. Di vê nivîsê de stranên Hisênê Omerî hatin e b i k a r anîn. Nivîskar helwesta civaka kurd ya li ser dengbêjên wekî Hisênê Omerî jî rexne kiriyê û wiha gotiye: "Di her çêr û nihurandîneke kurdî de hêmaneke jiyanê kurdan heye." Di heman katê de Çiya Mazî helwesta civaka kurd ya li ser namûsê jî rexne kiriyê û bal kişandiyê guherînan piştî Raperîna 15 Gelawêjê.

Li aliyê din Gabar Çiyan jî li ser kovara Hawarê bi navê "66. Saliya Hawarê pîroz be" nivîsek darêjtiye. Çiyan di vê nivîsê de li ser serpêhatiya danîna tîpên latîni, çîroka derxistina Hawarê û jînenîgariya wê rawestiyaye. Wekî diyar e kovara Hawarê di sala 1943'yan de di 15 Gelawêjê de dawî li weşana xwe anîbû.

Di vê hejmarê de ji van nivîsan pê ve, ev nivîs hatine weşandin: F. Huseyn-Şêx Evdîrehman, Ji tirkî wergera H. Kovvan Baqî- Rexne û Teoriyên Wêjeyî, Hozanê Dilzar- Şîrovekirina Hin Zaravayên Ramyarî û Yasakî, Bavê Hêmin-Rûpelî Ji Pêlikên Demokratîyê, Celîlê Celîl- Silav Li Te Helal Be, Osman Akdağ- Geştê Li Ser Kelekê, Montaigne- Li Ser Tiraliyê


Di vê hejmara Jiyana Rewşenê de ji giraniya helbestan diyar e. Di vê hejmarê de helbestên hatine belavkirin ev in: A. Rahman Çelik- Dîmek ji Bêdîmeniyê, Kawa Nemir- Pêçek û Ay lê Gulê, Bekir Merîç- Li Gabarê Li Keçîkekê Xistin, Nesîm Kasîrga- Hevrê, Hozanê Dilzar- Ji Bilûra Mîr Celadet re, Dost Çiyayî- Kevirtêrê, Nihat Çelik- Ey Yar, Adar Jiyana- Serkeftina Morîstanan, Bro. Omerî- Pazdehê Gelawêjê.

Her wiha strana Seyîdxan- Selhedîn ku ji devê Dengbêj Cemîlê Bafawî hatiye berhevkerin hêjayî xwendine ye.

SERWÎSA ÇANDE

Koçberî û çarîka bênamusiyê

HASAN KAYA



Sibehekê hê zû, ji nava nivînan hatin rakirin û li meydana gund hatin civandin. Du kom çêkirin. Yek ji jin û zarokan, yek ji mêran. Ji wan re hate gotin, "Bibîne qorîcî!". Wan got, na. Fermandarê artêşa xerabiyê got: "Du rê li ber we hene. Yek: Bibîne qorîcî, zikê xwe bi meqerna dagirin. Du: Heke hûn vê yekê nepejîrînin, darê zilmê û kotekiyê ji ser serê we kêrnabe. Bênderê we dê bêne sotin, dehl û rez û bexçeyê we dê bêne hişkkirin." Wan ev her du rê jî nepejîrandin. Ji xwe re rêyeke sêyemîn peyda kirin. Terka welêt. Belê koç û keriyê xwe dane hev û berê xwe dane riyên dûr.

Ez ji we re qala gundiyan Hespistê, ku li ser Hezaxa Mêrdîne ye, dikim. Gundê Hespistê yek gund e ji çar hezar gundên li Kurdistanê, ku bi destê qewmê lût hatine hilweşandin. Dapîrên Hespistê serhatiyên xwe, gundiyan Hespistê, gorên bav û kalên

xwe, êş û evînen xwe, xaka xwe ya ku nişana hebûna wan e, li wir hiştin û berê xwe dane xeribiyê. Mirovên ku mîna zarokên xwe ji kewên xwe yên kedî û pisîkên li nav malê hez dikirin, ew di nav pêtên agirê ku zebaniyan bera xaniyan dabû de hiştin.

Gundên derûdora Hezaxê zaf ji xweyîkirina pez hez dikin. Jixwe aboriya wan li ser xweyîkirina pez û çandina genim, nîsk, nok û ceh e. Gundên welatparêz, ên ku çarîka bênamusiyê nedane serê xwe, gelek tade ji destê nokeran û dewletê dîtin û hê jî dibînin. Koz û bênderê wan tene şewitandin. Nahêlin ku pezê xwe berdine çêriyê, her texlîtê îşkenceyê li wan tê kirin, a nemayî tînin serê wan.

Gundiyan Hespistê û yên derûdorê jî bo ku bikaribin çend quruşan berhev bikin, ji mecbûrî berê xwe dane derûdora Boluyê. Dê biçûna li wan deveran findik berhev biki-rana. Kalên xwe, zarokên hûr li Hezaxê, di çadirê naylonî de hiştin û wan berê xwe da cehnemê.

Lê sed carî heyf û mixabin ku qeza û bela dev ji pêşîra wan berneda. Di rîya navbera Edene û Enqereyê de, qemyonekê li dolmîşa wan da, zêdeyî bîst heb ji wan çûne rehetê. Wekî ku rojnameya Ü. Gündemê

nivîsbû, bila çavên rayederên dewletê yên ku gotibûn, "Emê koçbera bera nav bajarên xwe nedin" ronî be! Jixwe Serokê Belediyeya Edeneyê, erebeyên wan gundiyan ku qeza hatî serê wan, bera nav bajêr nedabû.

Em nikarin sedemê mirina gundiyan Hespistê wekî qeza nişan bidin. Rasterê qirkirin e. Ji bo ku gundiyan kurd hem ji gundên xwe bibin û hem jî terke dinya bibin, çî ji destê rayedarên dewletê hatiye kirine. Ji bo ku cîneyeta dewletê were pey-tandin, hemû nişan û delîl li holê ne. Cinayet ne ew e ku, rasterê yek bi destê yekî din were kuştin. Dewletê tu rê nehiştine ku gundiyan Hespistê bikaribin jiyanê xwe bidomînin. Gundiyan Hespistê, ji ber zilma dewletê debar nekîrîne û xwe avêtine behrê. Têv bi hev re xeniqîne. Ev qezaya ku di navbera Edeneyê û Enqereyê de çêbûyê, komkujî ye. Li welatekî şareza, pêşketî ku mirovperwerî lê hebe, navê vê qezayê "qetlîam" dê were danîn û yên ku bûne sebebê qetla wan dê werine darizandin.

Niha li gundê Hespistê şîr jî nîn e, lewre gundê Hespistê nîn e. Niha li gundê Hespistê tu kes hêstiran jî nabarîne, lewre tu çavên ku hêstiran bibarînin nîn in. Mîna çar hezar gundên din, li Hespistê jî dixwînin pepûk û kund.

Pêxemberê heywanan

Li welateke îslamî meleyek bi navê Hesên diyar dike ku ew pêxember e. Li hemberî wî, melayên welêt tev şaş dimînin û dibêjin:

– Wellehî ev çû ser kufrê.

Ji bo vê yekê mela tev tîn cem hev, gazî Mele Hesên dikin, jê re dibêjin:

– Mal xerab, tu meleyekî misilman î, çawa çêbû, tu ji ola xwe derketî? Tu zanî ku pêxemberê paşî Hezretî Mihemed e, piştî wî tu pêxember çênabin. Tu bi çi rengî dibêjî: “Ez pêxember im?”

Mele Hesên bi awayekî bi xwe ewle û bi biryar bersiv dide wan:

– Ez di gotina xwe de rast im û ez vêga jî dibêjim ez pêxember im. Heger hûn bawer nakin, roja îne werin ba min, ezê pêxembertiya xwe nişanî we bidim.

Meleyên herê mêmê tev dimînin ecêbmayî, nizanin êdî çi bibêjin. Bi hev re biryar distînin ku herin gundê Mele Hesên.

Piştî ku Mele Hesên difetile malê, gazî hemû mirûdên xwe yên ji gundên der û dora xwe dike û dibêje:

– Roja îne hûnê tev bi jin û zarokên xwe ve werin ba min. Tev bi eşq û kêf dibêjin: “Baş e!”

– Roja îne hemû mirûd tevî jin û zaro-

kên xwe diçin gundê Mele Hesên. Serê sibê Mele Hesên tevan li meydana dîke pênc beşan û ji wan re wisa dibêje:

– Gaveke din wê hinek mewanên min werin. Gava ku min kire gazî û min got, beşa yekê, wê ew beş wekî kuçikan biewte, ya diduyan wekî pisikan miyaw bike, ya sisêyan wekî keran bizire, ya çaran wekî bizinan bibarîne, ya pêncan wekî guran bizûre. Tev vê yekê dipejirînin.

Piştî ku roj hinekî bilind dibe melayên herê mêmê tîne gund. Gava ku çavên wan bi vê rewşê dikevin dimînin heyirî û şaş dibin. Peyde Mele Hesên wan dibe serê nepaniyekî û ji meleyan re dibêje: “Bala xwe bidine vê rewşê!” Peyre dike gazî: “Beşa Yekê!” Ev beş wekî kûçikan di-reye. Dibêje: “Beşa diduyan!” Ev jî wekî pisikan dibêje: “Miyaw!” Dibêje: “Beşa sisêyan!”, ev jî wekî ke-



ran dizire. Dibêje: “Beşa çaran!” Ev jî wekî bizinan dibare. Dibêje: “Beşa pêncan!”, ev jî wekî guran dizure. Peyde Mele Hesên berê xwe dide melayên herê mêmê û dibêje:

– We şêx û melayên sexte ev gel xistiye rewşa heywanan. Binêrin tev wekî heywanan in. Îcar ez jî pêxemberê heywanan im. Mîn negotiye ku ez yê mirovan im. Wexta ku gel ev be, bi hêsanî ez dikarim bibim pêxember, rabin herin malên xwe û deng nekin.

Meleyên herê mêmê heq didin wî û dibêjin: “Ku rewşa gel ev be, wê yên wekî te jî bibin pêxember.” Piştî stûyê xwe dixurînin û difetilin mala xwe.

FAYSAL ÖZDEMİR

Mele

Li gundekî meleyek hebûye. Rewşa aborî ya mele pir xirab e. Tiştêk mala mele de tune ye. Mal rût û tazî ye.

Rojekê mele jî canê xwe aci ze. Ji pencerê derve dinêre. Dibîne ku gel miriyek dibin mezê. Merivê wî miriyê di rê de digirî, dikin hawar û wiha dibêjin:

– Hoy birawo, hoy birawo, ma ne cihê ku tu diçî ne av heye ne xwarin.

Yekî dinê dibêje: Hoy birawo, hoy birawo ma cihê ku tu diçî ne lihêf heye ne balîf.

Mele bang li jina xwe dike û dibêje: Jinik hebe, tunebe wana mirî tînin mala me.


ZOZAN KAYA

BI XELAT...

XAÇEPIRSA BI XELAT (133)

XAÇEPIRSA


Selabêkî Tevî Dewrê Pêş	Hêş Bêlîn	Tîpêk Kurdî Erdî Mîrî Lîstî	Hêş Kurdî Erdî Mîrî Lîstî	Nawê Kurdî	Çawa Pêş Lîstî
B A L O N	L O N	E S E L	S A N E	K O M E L	M E L
H A S E L	E S E L	S A N E	S A N E	O T T E	T E
A Y S E L	E S E L	S A N E	S A N E	V A G C A	C A
A N O B E N A R	E S E L	S A N E	S A N E	R O N	N
E H L Î M A N Î	E S E L	S A N E	S A N E	R O N	N
A A A A A	E S E L	S A N E	S A N E	R O N	N
A N A N A N	E S E L	S A N E	S A N E	R O N	N



Bersiva Xaçepirsa 131'ê

Xaçepirsa me bi xelat e. Di 15 rojan de çi bersiv bigihîjin destê me, em dê wan binixînin û bi riya pişkê li 5 kesên belav bikin. Xelata hejmarê me ya 133'yan pirtûka Felat Dilgeş 'Kurdistan'ê.

Jêrenot:
Ji bo ku bersiva we bê nirxandin, divê hûn "Peyva Veşarî" di nava qutiyên li bin xaçepirsê de binivîsin û tevî navnîşana xwe ji me re bişînin.




Pênc kesên ku xelata hejmarê 131'ê pirtûka Selîm 'Yûsiv û Zuleyxa qezenc kirine: Mustafa Fîrat/Êlih, Zozan Adigüzel/ Amed, Şükran Nûrî/ İzmîr, Cemal Özgül/ Semsûr, Emin Özcan/ Mersîn.

Gelo Şehîdek (Wêne)	Qertala neyiniyê Stêrk	Hacet Kinivisa Lîtreyê	Din Îstikrar	Mehele Dem	Di helbestê de çar rêz
		6			
Paşgîrek		Çewal Navekî Jinan		Pênasekfe odal Notayek	
Sembola hidrojênê					
	Aj Arikar		Dijberê Çep Dijberê biyan		Bi kirdkî çiya
Ji Xweliyê			Sewalek çêjek. Temek		Cinavkeki
Eşîr					
	Xeşim Berheme- ke Şîr	3		Hezar kilo Bi Soranî iro	2
Navekî Jinan Gelekî qedim		Hejmarek Perkitek		Sembhola oksijenê	
			Tirk Bi kirdkî erê		
Ne awarte Bi Îngilîzî huner				Tîpa piştî P' yê	
		Wate, Yanê		4	



PEYVA VEŞARÎ



VENGÛVAZÊN KE HAMEY SANSÛRKERDIN

Berpîrsê ERNK'yê Jûbiyayîna Dewletanê Xoserî Mahir Welat:

Wayîrê projey xetê borî gere bi PKK'î bişêwrê

9 gelwêj 1998

Barpîrsê ERNK'ya Jûbiyayîna Dewletanê Xoserî Mahir Welatî vat ke muhatabê xetê borî ê petrolî yê Baku-Ceyhanî kurdî yê, gere şima bi şarê kurdî û Serokatîyê inan bişêwirê. Welatî vat: "Dewletê ke ena proje virazenê, gere verî şorê serokatîya PKK'î ra xeber bidê.

Mahir Welatî rojo verîn di paytextey Rûsya Moskova de pêserameyinekey çapemenî viraşt. A pêserameyîna di navenda çapemeniya Rûs-Amerîkan de viraziya. Çapemeniya navneteweyî, radonî, televîzyonî, rojnamey û welatên biyaniyan re xeylê (zehf) nûnerî tewrê pêserameyîna bî. Welat, anceyîna petrolê Hezarî ver bi bazarê dinya ser ro fikrê ERNK'î ardî zîwan û da zanayîna ke dimay raşiyayîne Jûbiyayîna Sovyetî, seba bidestfistina neftê Behrê Hazarî, Kafkasya, Asya û Gazê wîja, dewletî têkoşîn danê û erdê kurdan de jî dewletî henî (tayn) projeyî virazenê.

Mahir Welatî xeynî projey xetê borî ê Bakû-Ceyhanî, projey gazî ê Kerkûk-Samsun-Ukrayna, Tûrkmenistan-Iran, Rûsya-Tirkiye û di herêm de ser projey ow (aw) de jî vindert û ana (wîna) vat: "Nê projeyan ser ro lecê pîl ê quwetê îdeolojîkî estê. Nê pêrodayîni serê qederey kurdan ra nizdî de girêdayî yê,



Mahir Welat

coka gere viraştinê nê projey de berpîrsê projeyan fikrê nûnera kurdan PKK'î jî bigirê.

10 gelawêj 1998

HEDREYÎ QEYBÎ TELEVÎZYONÊ TILYAK

MED-TV, kampanyaya ke Ewropa de sazîyanê kurdan bin sernameyê: "Tilyak kişeno, ma jîyaney însanî bixelînin" de dawa destpêkerdîni, sero panelekew viraşt, nûnerê ERNK'î yê Ewropa Kanî Yilmaz jî tewrê na panelî bî. Yilmazî karê dewleta tirkî ê limînî

(lîşînî) ser ro zanayîne balkêş day û ana (wîna) vat: "PDK û Tirkiye bi perey tilyakî demê peyîn de hedrekarî kerdê ke televîzyonêke akerê."

Yilmazî vat ke tilyako ke Tirkiye de wo nigêkey cê zî PDK wo. Ey badî wîna vat: "Demo peyîn de Tirkiye û PDK bi perey tilyakî hedreyî seba akerdenê televîzyonî kenê û no televîzyonî zî zey alternatîfêkey MED-TV'î vecenê û ma weş xeberî girot ke ê wazenê perey ke tilyak ra qezenc kerdê û di karê televîzyonî de bikar biyarê, di Swêd de kenê pakî."


Yilmazî da zanayîna ke dewletê tirkî şero ke kena bi perey tilyak û bi perey turîzmî ramnena. Berpîrsê ERNK diyar kerd ke par çîqas di turîzm de peydeşiyayîna bibî zî, di tilyak de raverşiyayîna vejiya werte. Badî Berpîrsê ERNK Ewropa vatîne xo wîna berdewam kerd: "Hendî tilyak tekellekey dewleta tirkî wo. Hawaw ke yeno vatîna mardîmanê ke karê tilyakî kenê henî hetî, yan jî mafya niya. Şerê kew pancîyes serî yo dewam keno xoser niyo. Tabî di enî de destekê kaneperestan esto la esil çimeyê cê tilyak o."

Yilmaz, ser tilyako ke Tirkiye serê balkanan ro bena Ewropa de vindert û da zanayîna ke Tirkiye bi perey tilyakî panzêran û silehan herînenê. Yilmaz ser kampanya bi nê vatînan qîseykerdîne xo qedêna: "Ene kampanya hetê kurdan re yewemîn a, ma piştgirî danê ene kampanya. Ma çende noxtan ro haynenê ene kampanya ra. Verê heme çî o kar sûcê însaniyetî yo. Şero ke di welatê ma de dom keno bi enî karî xo keno mird. Ma wazenê welatê xo teslimê xortan bikerê. Berpîrsê ke ma esto ke ma inan bipawênê. Seba sebebanê polîtîka ro ma her kesî zehfîr piştgirî danê ene kampanya."


Çapemenî
awêne ye,
divê rastîyan binimîne.
Lê, li hin deran
dibe xapemenî
bindestan li zînanan diqelibîne
Di destê zordestan de
dibe teqemenî
Ziravê xîzanan diqetîne.
Lê li welatê me
kulfîkeke kesk û sor û zer e.
Zap e, Ferat e, Ava Şîn e.
Ferhat, Aysel û Safyettîn e.
Mamoste ye li Serêkaniyê
nûçeyên dozê radigihîne.
Zîmanê kurdî fêr dike;
Huseyîn e.



Hüseyin Deniz



Ferhat Tepe



Aysel Malkaç



Safyettin Tepe

PÊNÛSA WE LI ERDÊ NAMÎNE! DOZA WE DOZA ME YE!

XEBATKARÊN AZADIYA WELAT

WELAT
ROJNAMEYA HEFTEYÎ
(Haftalık Gazete)

■ Xwedî (Îmtiyaz Sahibi)
M. NURI KARAKOYUN

■ Yönetim Yeri
İstiklal cad. Asmalı Mescit sok. 35/37 No:308

Beyoğlu/İstanbul
TEL: (0 212)
251 79 37-251 90 13
FAX: 251 95 85

■ Gerîndeyê Giştî yê Weşanê
(Genel Yayın Yönetmeni)
SAMİ TAN
■ Berpîrsê Karên Nivîsaran
(Yazı İşleri Müdürü)

M. SALİH TAŞKESEN
■ ÇAPXANE
Yeni Asya Matbaacılık A.Ş.
■ Yayın Koordinasyon:
Gündem Basın ve Yayıncılık San. Tic. Ltd. Şti.

■ BELAVKIRIN
BIRYAY Dağıtım
■ NÜNERİTİYEN ME
(Temsilciliklerimiz)

■ Mersin
Tel: 0 (324) 233 83 96

■ İzmir
Tel: 0 (232) 425 37 02
München:
(Nünerê Giştî yê Ewrûpayê)
Mahmut Gergerli
Tel: 49 871 672 29
Fax: 49 871 670 815

■ Swîsre:
İhsan Kurt
Tel-fax
41 21 652 76 07
■ Hollanda:
S. A. Fewzi
31 104 85 55 43
■ Suriye:
Jana Seyda
Helim Yüsvî

Zimanzanî kurd Kurdistan Mukriyanî

Debêt ronakbîr rastgo bê

Wênaranî berêz çawpêkewtinî emcareman, legel şareza û zimannasêkî kurd e, le banderan çawman pê kewt, w ewîş Dr. Prof. Kurdistan Mukriyanî-ye. Lem çawpêkewtine da em pirsyaraney xwarewe arastey ewman kirdin.

Her çende nasraw î, belam hez dekeyn ziyatir bitnasîn?

✓ Min le Hewlêr hatumete dunya, we le Hewlêr xwêndingay seretayî û nawendî we diwa nawendîm, le Bexda beşî zimani kurdîm tewaw kirduwe we le derewey welat da xwêndinî balam tewaw kirduwe we piley doktoram hênawe le zanistî jîrolojî, be taybetî zimani kurdî, le duway tewawkirdinî xwêndinim, le nêw welat da karîm le zanko da kirduwe.

Gelek nûser hen delên; Zimani kurdî beşî hemû awatekanî ême naka, le ber ewe ême neçar debîn bo bekarhênanî zimani bêgane?

✓ Hiç zimaneke le cihan da xoy be tenya zimaneke natwanêt hemû babetêkî pê binûsrêtewe, boye neçare hendê wuşe le zimani bêgane we ya le zimananî dewrûberî xoy qerz bikat, boye zimani kurdîş weku hemû zimaneke dî hendê wuşe qerz deka, belam zimani kurdî weku her zimaneke detwanê hemû beşêkî zanistî pê binûsrêtewe we detwanê wuşe qerz bika, çon kurd qerz deka dirawsêkanî kurdîş gelek wuşe le zimani kurdîya qerz kirduwe. Ew kesey delêt natwanim be zimani kurdî binûsim û mebestî xom der bibirim her bo ewe degerêtewe çunke le seretawe ew be zimani kurdî neyxwênduwe we şarazayêkî ewtoyi le zimani kurdî niye.

Aya rewşanbîranî kurd detwanin bibin be çînekî karîger bo ew kosp û tegeraney ramyarî ke Kurdistan tê da dejît?

✓ Rewşanbîrî kurd debêt rolêkî diyarîkirawî xoy binwênêt le beramber ew kosp û tegeraney ke le pêş kurd da heye, belam bedaxewe ke ta êsta neytiwanîwe bo ewey lem boware da rolî diyarî xoyan bibînin, êsta le hemû helêk pêwîst tir e bo ewey rewşanbîrî bitwanêt be pê rewşanbîrî xoy we be pê ew pisporyey xoy ke peyday kirduwe, ew ezmongerî ke wa heyetî detwanêt careyêk bo ew kêşane bidozêtewe ke kurd pêda derwa belam be mercên; ewaney desthelatdarî kurd in goyan lê ragirin we rêgayan biden û gift û goyan le gel da biken, le ber ewe natwanin be bê ewan hergîz berangarî ew hemû teng û çelemane bin ke beramber kurd da dirust dekrê we heye. Rewşanbîrî detwanêt rolekî gelêk baş bigêrêt we le bigerêt.

Çi cîyawazî le beynî rewşanbîrî kurd û cihanî da heye we to çon rewşanbîranî kurd debînî?

✓ Rewşanbîranî çî kurd û çî cîyhanîye hemûyan rewşanbîrî in, belam cîyawazî le we da heye ke rewşanbîranî cihan zorbeyan xawen komar in, wate xawen pêna-



sey xoyan in, belam rewşanbîrî kurd xawen pênasay xoy niye. Boye duçarî kêşeyêkî gewre debêt, cîyawazîyeke tenha le we da ye, belku min detwanim bilêm rewşanbîrî kurd zor rewşanbîrî e le waney tir, çunke ziyatir le kêşeyêkey xoy dekoletewe we ziyatir xoy mandû dekat bo ewey pê biga çunke kes niye haney bida, kes niye yarmetî bida, kes niye piştî bidatê yan be saman yarmetî bida we lew şwênaney ke kurd tê da dejî hergîz hiç desthelatdarêk ke wa fermandarî kurd deken aferînyan le rewşanbîrêkî kurd nekirduwe, ca boye le barêkî zor sext da dejît, tenya çareserîşî ewe ye ke wa xawen pênasay xoy bê weku her rewşanbîrêkî em cîhane.

Ewe çon temaşey şerî xiyaret û kurdkujî deken? Aya hiç berhemêkî heye le ser em babete.?

✓ Kurdkujî karêkî narewa ye we hergîz kurd nabê bir le we biketewe ke biray kurdî xoy bikujê. Min çend wutarêkim ke le ser şerî birakujî bilawim kirdunewe, honraweyêkişim derbarey eme bilaw kirdutewe, helbet tegerêkî zor gewre ye le rêgay kurd da we êmey kurd hemîşe hewil bideyn yektirman xoş biwêt hemîşe xamekanman le pênanawî wuşeyêk da bê ke em wuşeyê le xizmetî gelî kurd da bê, we

BERHEMEKANÎ KIRDISTAN MUKRIYANÎ

- 1- Ferhengî Kurdî-Rûsî, 1977-Rûsya
- 2- Honrawey Afretî Kurd, 1980-Hewlêr
- 3- Keşkolî Cîn (2 berg) 1983 û 1988, Hewlêr
- 4- Bîst Çirokî Filklorî Kurdî, 1984- Hewlêr
- 5- Zare Kurdîyekan. 6- Rêzmanî Kurdî - Hollanda . 7- Tîşkêk li ser zimani danîştuwani kornî Kurdistan, 1995- Hollanda. 8-Rengdanewey dozi jin , 1995- Hollanda. 9- Jinî kurd û dozi netewayetî 1995- Holenda. 10- Sintaksi ristey kurdî, 1997- Hollanda
- 11-Jinî kurd be sitem dewr dirawe 1998- Hollanda
- 12-Ristey zimani kurdî (Be zimani erebî derçuwe), 1990-BEXDAD

le xizmetî mirovayetî da bê, le xizmetî xonasanî kurd da bê nek le xizmetî ewe da bê ke wa; min agir ziyatir xoş kem, belko hewil bideyn hemû hêz û tuwanaman le we da kom bikeynewe ke ême yek bîn çunke kêşey kurd yêk kêşey ye nabê dabeş bîkrêt, ewîş pênasay netewayetî man e.

Aya hêze ramyarîyekanman debine hoy le yêk cîyakirdinewey nûser û rewşanbîranî kurd.?

✓ Eger ronakbîr ser be yekêk le hêze ramyarîyekan bê, ewsa rengî ew hêze ramyarîya lew rewşanbîre reng de datewe, belam eger ronakbîr le derewey em hêzane bê ewe ewsa detwanêt be serbestî bir bikatewe we detwanê dewr û berî xoy çaktir bibînê le wey ke le naw hêzkey da ye, belam debêt ronakbîr hemû katê xawen helwîst û rastgo bê.

Zimani kurdî le çend zarawayêk pêkhatuwe we her deverêk be pêy şewazî xoy denûsin, aya le paşerojî zimani kurdîş weku hemû zimaneke tîr, şewazî nawendî ya xot standart durist debêt.?

✓ Zimani kurdî emro be şewêkî giştî le du şewazî serekî pêk hatuwe ke emro zimani nûsin û qisekirdin in, helbet şewa-

zekanî tirman hen belam ewane tenya hî nî qisekirdin in we pê nanûsrêt eger yêkêk helgirî şewazêk bê bo nimune; be şewazî hewramî dedwê, belam be soranî denusêt wate (kurmancî nawerast) ke min way pê delêm. Ca ême du şewazman heye ke pê denûsrêt û qiseş pê dekrêt le heman kat da. Helbet min boçûnim wa ye le dahatû da şewazêkî nawerast pêk dêt bo nûsîn boy nebûnîşî ta êsta debête hoy em sînorane ke kewtûnete nêwan danîştuwani Kurdistan.

To çon paşerojî kurd debînî?

✓ Kurd weku her gelêk mafi ewey heye bir le paşerojey xoy bikatewe we hewil û koşey bida bo ewey weku hemû gelaney cihan be aşî û asayîş bijît. We min lew bawerem îtir katî ewe hatuwe ke wa kurd bitwanêt le gel dirawsêkanî xoy be tebayîşî, belam tebayîyêk bê, be corêk bê le wa le maf da, le jîyan da weku ewan yek yan bin, jêrdestî û zordarî nebê we bitwanê zimaneke hawbeş le gel dirawsêkanî xoy da bidozêtewe we hewil bida bo ewey pê bigeyênêt ke ewîş lew cîhane mafi heye hewa helgoşê weku ewan be azadî.

To çon rolî jinî kurd le nêw çapemenî kurdî da debînî?

✓ Rojnamegerî kurdî êsta temenî sed saleye, rolî jin le temenî em sed saleye detwanî bikem be du beş be pêy lekênewey ke min kirdume. Yekemyan; ta salî 1970 we duhemyan; ta em salane. Ke temaşey yekem rojnamey kurdî dekey ke be nawî Kurdistan le salî 1898 derçuwe le wê da babetêkî ewto niye be nawî jin yan le ser kêşey û giriftarî jin, bo wêne le salî 1913-14 ke kobûneweyêk bo afretî kurd dirustyan kird. Eme basî giriftarkan jinî dekirî em em kobûnewa le hendê rojname bilaw kirdewe belam be zimani turkî le wê da basî du babet dekrê yekem Kar bo jin bidozêtewe, duhem: yarmetî jin bidrêt bo ewey bixwênêt. Wate em dî kêşey le ser jin bilaw kirduwe, le duway eme zor piyaw basî jin kirduwe belam le yekemîn car le naw rojnamekanî başî Kurdistan da le salî 1937 babetêk berçayî dekwê be nawî kiçêkî kurd, le wê da basî kêşey kurd be giştî deka nek tenha jin we lemew duwa zortir debîn belam em nûsînanane zorbeyan piyawnûsiyetî be nawî kiçewey çî be nawî kiçî xoy yan xwîşî xoy yan afretêkî tir belam karigerêkî zoz hebûwe boy jin dekwê. Belam duway salî 1970 jinî kurd xawen nûsîn û xawen birêkî rastewxoye we be pêy ew lêkolîney min kirdume, jinî kurd le duway salî 1970 cêgay xoy girtuwe.